

ARMANC  
Ji mehê  
carekê  
dertê  
Hejmar: 102  
Adar  
1990  
Buha: 10 Skr.  
3 DM


# Armanç

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

ARMANC  
Monthly  
Kurdish  
Magazine  
No: 102  
March  
1990  
Price: 10 Skr.  
3 DM

Esnafe dikanên xwe digrin, xwendevan naçin mekteban, "pêşmerge" bi kevîr û daran êrîş dibin ser leşkerên kolonyalîst...

## Kurdistan rabû ser piya



Li Cizîra Bota lawên Tacdîn, Çeko bi kevîr û daran êrîş birin ser tanq û leşkerên dijmin. Dema mîlet yek be û dest bibe xwe kî dikare wan bisekinîne? (Foto: Ali Ekeyilmaz)

□ **Întifada li Nisêbinê dest pê kir û li hemû qezên Mêrdînê geş bû, li Cizîrê gihîşt merhala bilind. Bi însiyatîfa Partiya Pêşeng li Farqînê û bi banga "Platforma Demokratîk" li Diyarbekirê esnafan rojekê dikanên xwe girtin.**

□ **Di întifada Nisêbinê û Cizîrê de 6 welatparêzên Kurd şehîd ketin, bi dehan kes birindar bûn û bi sedan kes jî hatin girtin. Karbidestên kolonyalîstên Tirk ji bo ku pêrgiyê li vê berxwedanê bigre civîn li ser civînê çêdikin.**

Nûça wê di rûpela 9'an de

Di salvegera duduyan de

### Qetlîama Helepçe bi tundî hat protestokirin

Li Kurdistanê Tirkîyê, li hemû unîversîteyan, li gelek bajaran, li derwayî welat û çî bigre li hemû ciyên ku Kurd lê cîwar in bi aktivîteyên cur bi cur qetlîama Helepçe hat protestokirin.

Roja 16'ê Adarê wê tu carî neyê jibîrkirin. Her sal wê ev roj bê bibîranîn û her di vê rojê de wê gelê Kurd rejîma xwînwar a Saddam biricimîne.

Gelê Kurd roja 16'ê Adarê li her çar perçên Kurdistanê, li derveyî welat, li hemû cî û warên ku Kurd lê hene bi tevger û aktivîteyên cur bi cur qetlîama Helepçe; 5 000 şehîdên xwe bi bîr anî û re-

jîma xwînrej a BAAS'ê ricimand.

Li gel hemû şertên giran û zordariyê gelê Kurd li Kurdistanê Tirkîyê di vê rojê de bi protestoyan dengê xwe bilind kir. Di roja 15'ê Adarê de li Diyarbekirê, Xortên Şoreşgerên Demokrat li ser riyên girîng ên bajêr barikatan danîn, li dijî rejîma Saddam bi dengê gurr slogan avêtin. Di roja 16'ê Adarê de dîsa her li Diyarbekirê li dor

3000 kesî meşek bêdestûrî li dijî rejîma Bexdadê pêk anîn.

Li Unîversîteya Meletiyê komek xwendevan li ber derê Unîversîtê civiyan û qetlîama Helepçe bi şîarên wek "Bimre Saddam!", "Bimre faşîzm!" û "Bimre mêtîngehkarî!" protesto kirin.

Li Unîversîteya Egeyê li dor

Dûmahîk r. 11

#### HELEPÇE -BAJARÊ MIRÎ

EŞREF OKUMUŞ (Rûpel: 6)

#### "LI BER BA ÇÛNE"

Hevpeyvîn bi NADÎROV re (Rûpel: 7)

#### LI SER PIRSÊN SOSYALÎZMÊ MUNAQEŞE PÊWÎST E

B. HÉVÎDAR (Rûpel: 4)

#### KONFERANSA NAVNETEWÎ YA KURDISTANÊ LI FLORENSAYÊ

(Rûpel: 3)



Rojeva Mehê

# Gelo Ş. B. Soreklî ji Armancê "azadiyek" çawa dixwaze?

Reşoyê Gerejdaxî

## Destpêka qonaxek nuh?

Piştî erîşên xwînrej û kuştin û sirgûnkirinê yên dewleta Tirk ên van salên dawiyê di ve meha adarê de li dijî pirozbahiyan Newrozê û protestoyên bi biranîniyên qetliama Helebçê "kêr gihandin hestî", piingardana nerazibûn, acizî, êş û hêrsa gelêri nema xwe girt, berda li ber xwe teqand û wek lehiyekê pêl bi pêl li qeza û bajarên Kurdistanê belav bû.

Roja biranîna qetliama Helebçê du hezar kes li Diyarbekir meşiyabûn û şer di navbera wan û polîsan de derketibû, bi sedan kes hatibûn girtin. Lê destpêka pêla liberxwedana gelêri li Nisêbinê dest pê kir, piştî Cizîrê, Midyatê, Silopiyê, Îdilê, Kiziltepe û Dêrikê da ber xwe. Diyarbekirîyan pê re mil dan ber ve pêlê, bi wan re Sêrt, Batman, Licê û Hênê daketin meydana.

Bi van rûdanên han, cara pêşin nerazibûn, acizî û hêrsa gelê Kurd bi ve berfirehiyê karekterekî gelêri wergirt. Loma ji meriv dikare bêje ku, ve pêla han da xwiyakirin ku di lêkoşîna rizgariya netewî de dikare bibe gavek pêşin ji bo qonaxek nuh, qonaxa lêkoşîna rizgariya cemahîrî. Ev ditin ne ya me tenê ye. Eşkere ye ku dewleta Tirk a dagirker ji gihastiye ve baweriyê. Loma ji tirs û xofek mezin ketiye dilê dewletê. Heta roja îro, dewletê rê li ber xwe didit ku li hember bûyer û rûdanên dest bavêje demagojiya "terorizmê". Lê pêlên berxwedana meha Adarê a gelêri derbek giran li demagojiya dewletê a li ser îdia terorizmê xistin. Berdevkên dewletê yên resmî bi harbûnek wisa radi-bîn pê ku, êdî nema qala dewleta huqûqî ji dikin, êskere xwedî li erîşkari, zor û kuştina bê perwa derdikevin. Li hember mixalefeta netewî ya gelê Kurd hezên siyasî yên burjuwaziya Tirk bi hukumet û mixalefeta xwe bûne yek, terora ordiya Tirk a hov û har diparêzin, hê pirtir gij dikin ku erîşên çekdari ev tevger bê pelixandin. Ozal, İnönü, Demirel û Ecevit xwe bi generalên kevn û nû yên militarist re kirine yek û bi yek devî qise dikin: "Berî her tiştî divê ev rabûn bê şikandin û pûçkirin.

Ev siyaseta yekdevî ya berdevk û berpirsiyarên dewleta Tirk ji bo Kurdan ji lazîme bibe sinyalêk hişyariyê û li xwe varqilîne. Erê, tevgera rizgarixwaziya gelê Kurd ruyekî berfirehî û cemahîrî werdigre, lê divê em bi xemsariya xefletê xwe nexapînin û ji bir nekin ku ev yek di vî warî de bes gavek e, gava pêşin e. Gava duduyan, a li pey wê û yên li pey wan pêwîst e bi haziriyên xurttir û tekûztir bîn. Yan na, gava duduyan dikare bibe gavek paşketitir ji.

Bi munasebeta 10 saliya Armancê nameyek pîrr "enteresant" a Şahîne B. Soreklî di hejmara Armancê ya 100î de hat weşandin. Berî weşandina nama Ş. B. Soreklî, gelek namên hin xwendevanên din ji her bi ve munasebeta "10 saliya Armancê" hatibûn weşandin. Bi qasî ku tê bîra min, di naman hemuyan de rast ya jî çewt, di cî de ya ne di cî de li ser ziman, şikil û naveroka Armancê rexne û pêşniyar li ser Armancê bûn. Û ji xwe tiştê hatibû xwestin jî ev bû.

Ş. B. Soreklî jî di dîlê ku wek hemû xwendevanên din li ser Armancê dîtina xwe bibêje, ya jî ger hebe, pêşniyar û rexne xwe bîne, rabûye li alîkî bi hawakî bêmane pesnê "alimî", "objektîvî" û "mezîniyaya" cenabê xwe daye û li aliyê din jî çî hatîye ber devê wî bi uslûbeke xerab, bi zîmanekî wulger û bi Kurdîyeke çewto-mewto, gotin li pê hev rêz kirine; ku pîrên wan ji bin de ne mijara nivîsê ne. Wî, bi ve yekê jî qîma xwe neaniye, piştî çend rêzên destpêkê Armanc jî tê de, dilê xwe li hemû kovar û rojnameyên Kurdî û Kurdên "ne wek xwe" rehet kiriye, gişên wan bi "Bêistîqrariyê", bi "murîdiyê" û bi "hezadabûnê" îtham kiriye. Hetta, hewqasî pêş de çûye, ji Armancê daxwaz kiriye ku ew ji nuha û pê ve rûpeleke xwe bide "bîr û baweriyên azad". Îcar a baştir ew eku bi kurtayî be jî, li vir ez cî bidim "pêşniyarên heja" yê Ş. B. Soreklî.

"Min xwest ez pêşniyar bikim, ku Armanc kêmasî rûpeleke xwe bide bîr û baweriyên azad".

### Heqaret

Ev pêşniyara cenabê Ş. B. Soreklî tê ve manê: Armanc rojnameke ne "azad" e, cî nade fikrên "azad" û bîr û baweriyên tê de tîn parastin ji ne "azad" in. Loma jî Ş. B. Soreklî dixwaze ku ji îro û pê ve di Armancê de "ji bo bîr û baweriyên azad" rûpelek vebe. Bê guman ev, ji "pêşniyarekê" bêtir li hemû nivîskar û redaksiyona Armancê heqaretek mezin e. Lê ez di wê baweriyê de me ku Ş. B. Soreklî ne di wê mustewayê de ye ku karibe ma'na van gotinên xwe tê bigihîje. Heger ne wisa bûya wî yê ev gotinên mişt heqaret bi navê "pêşniyarê" pêşkêşî Armancê nekira. Ya jî ew, bîr û baweriyên însanên bi rêxistin "azad" nahesibîne.

Ş. B. Soreklî mebesta xwe ya bi "baweriyên azad" jî wiha aniye zîmên: "Mebesta min bi 'azad' weşandina wan gotaran e, yên ku ji hêla nivîskarên objektîv de tîyên nivîsandin, nivîsarên ku pêkan e ji felsefeya rojnameyê, yan partiyekî yan partiyane derbin, nivîsarên ku bi ilmî û bi armancên rind tîyên nivîsandin".

Di serî de tiştê ku bala meriv dikşîne, xwediyê van gotinên pela-pûçî bi hawakî ciddî xwe nivîskar dihesibîne. Û ji xwe li Ewropa êdî werbûye ku her kesê "xwendin" û "nivî-

sandina" wî hebe xwe "nivîskarê Kurd" dihesibîne.

### Nivîsên ilmî

Leyse, yanî li gor ve reçeta Ş. B. soreklî ya bi Kurdîyeke çewto-mewto baweriyên ku li gor felsefa rojnameyê ya jî li gor a partiyekê bin ne "azad" in û nivîskarên wan jî ne "objektîv" in. Ji bo ku ew "objektîv" û dîtînen wan jî "azad" bin, divê berî her tiştî ew, ne hevalên tu partî û grûban bin. Bi gotinek din divê ew ne neferê ordiyeke bi organîzasyon, lê donkîşotekî reben bin.

Bê guman heqê me tuneye ku em mesela "ilmî" jî ji bîr bikin. Li gor "pîvana" Ş. B. Soreklî ew kesên li gor felsefa rojnameyê ya jî partiyekê dinivîsinin (nizanim Ş. B. Soreklî li gor felsefa kê dinivîsîne û cardin nizanim çima "felsefa" wî, ji ya yên din baştir e?) ne "ilmî" ne. Esas wî, pîvanên "aliman" û nivîsên "ilmî" baş diyar nekiriye. Lê li gel ve kêmasiyê jî bi qasî ku meriv tê digihîje ew, nivîsên xwe pîrr "ilmî" dibîne. Bê şik, marifeta mezin jî ew e ku meriv xwe "alim" û nivîsên xwe jî "ilmî" bibîne.

Li alî din, Ş. B. Soreklî ji kovar û rojnamên Kurdî gazin dike, dibêje: "Di rewşa îro de nivîsandin û weşandina nivîsarên wisa di rojname û kovarên Kurdî de hema hema tiştê ne pêkan e". Û di vî warî de numûneyê jî dide: "Ber çend salan hejmareke mezin ji gotarên min, ez bawer im ê bi dehan nivîskarên din jî hebin nehatin weşandin, yan guhertin tê de hatin xwestin".

Piştî van rêzên jorîn min ji xwe re got, bi rastî qey ez di guhê gê de bûme, çimkî "bi dehan" nivîskarên Kurd hene û nivîsên "ilmî" nivîsandin û piştî ve cefakarî û fedekariya wan a "ilmî" kesî nivîsên wan ne weşandiye. Gelo van nivîskarên me kî ne û kîjan nivîsên "ilmî" nivîsandin? Lê bi dîtina min, a rasttir, Ş. B. Soreklî dema bi dehan "nivîskarên" din ji xwe re dike heval ne ku bi rastî wer bawer dike, ji bo ku hinekî "mutewazîtiyê" nîşan bide û bes nebêje "ez" ji xwe re hevalan çê dike.

Ş. B. Soreklî dibêje: "Bi salan em hatin xapandin, îro jî ji me tîye xwestine em nîşê nuh bixapînin. ew hejmara piçûk ku dikare gotarên nivîskarên Kurd bixwîne, fersend bo wî nîne, ku li ser 2, yan 3, yan 4 bîr û baweriyên bixwîne û wisa bi şeweyeke raste-rast ji wî tê xwestin ku bi mirûd be".

### Mefhûmên siyasî

Bi van gotinên tewşo-mewşo baş diyar e ku Ş. B. Soreklî parastina îdeolojiyê "xapandin" û endambûna partiyekê jî wek "mirîdiyê" qebûl dike. Yek, carê ez nizanim kê ji Ş. B. Soreklî xwestiye ku ew "nîşê" nuh bixapîne? Dudu, ji bo çî û ji çî

re? Sisê, çend kovar û rojnamên bi Kurdî derdikevin hene, di wan de gelek çelemên cihê dinivîsinin. Ji ber ku kovar cihê ne, şexsên cihê ne pîrr tabîye ku wê dîtînen wan jî cihê bin. Kî pê li perê xwe ke ewê wan bikire û bixwîne. Çima "fersend tuneye" ku (nîşê nuh) van weşanan û nivîskarên bixwînin? Ya jî Ş. B. Soreklî xwendina "gotarên" kê û yên çawa dixwaze? Û ya din jî heger parastina baweriyekê "xapandin" û "mirûdî" be, Ş. B. Soreklî jî li gor "bîr û baweriyekê" xelkê wisa îtham dike; wê çaxê ew, "mirîdê" kê ye, "er-bana" kê lê dixê û "qesîdên" kîjan "şêxî" dibêje?

Ş. B. Soreklî, qaşo-maşo li ser 10 saliya Armancê nivîsek nivîsandiye, lê ji nivîsê wêdetir bobilatek ecêb çêkiriye, bi nezaniya Kurdan qîma xwe neaniye rexneyên xwe derbasî qada navnetewî jî kiriye, gotiye:

"Li Romanya û hin şûnên din me dît ku çîqa şexek bi zorê tirşikê bide mirêdan jî, van mirêdan bi salan ji neçariya xwe pesn û senaya wî bidin jî, rojek pêkan e were, ku mirûdên duhu ê ne tenê tufe wêneya şexê xwe kin, lê bi ser de bimîzin jî û ev li pêş çavên cihanê, di telewîzyonê de".

Berî ku ez çend gotinan li ser van peyvên Ş. B. Soreklî yên bêsewiye bibêjim, dibê diyar bikim ku ez, ne bikirinên Çawuşesko re bûm û ne ji bi koranî bi kirinên yên îro re me.

Bê guman mafê her kesî heye ku dîtina xwe bibêje, tiştê ku rast nebîne rexne bike. Ev mafekî demokratîk e, pîrr hurmet û toleransa min jê re heye. Lê rexnen siyasî dibê bi mefhumên siyasî bibin, "xeber", ya jî zîmanekî "xeberokî", ne karê însanên siyasî ye. Ş. B. Soreklî di bin perda "rexne" de gotinên bêdeb kiriye, lema jî ez li hember wan ne bi tolerans im. Ne ji ber ku Ş. B. Soreklî ji Çawuşesko re kiriye, na, heger yekî din jî Ş. B. Soreklî re ji kiriba her wê bi min ne xweş ba. Ya dawî, ez dibêjim ku yê bi qimeta "wêneya" xwe bizanibe bi ser wêneya xelkê de "namîze!"

### Namên Gihîştine destê me

- Şevger (Flen-Swêd)
- Temûrê Çilderguşî (Çekoslovakya)
- Kamuran Haciabdo (Yugoslavya)
- Cotyar Çelki (Kampa Diyarbekrê)
- Mamed Merwanî (Stenbol)
- Alan Hajo (Sandviken-Swêd)
- Riza Colpan (Awusturya)

Redaksiyon: M. Eli, Zinarê Xamo, Hesên Mizgin, Lewend Firat, Mirza Bextiyar. Redaktorê berpirsiyar: M. Eli. Berpirsiyarê beşê Dîmilki: Malmisaniyê

Adres: Armanc  
P. Box: 6004  
172 06 Sundbyberg  
Sweden

Telex:  
ATTN ARMANC 11083 TELE KC  
Telefax:  
ATTN ARMANC 46-8-801825

Ansvarigutgivare:  
Kurdiska Demokratiska  
Arbeter Unionen  
Postgö: 50 37 99-9  
ISSN: 0348 7385



# Êrişên dijmin agirê Newrozê gurrtir kir

Li Diyarbekirê bi hezaran xwendevan di unîversîtê de agirê Newrozê dadan û li dorê govend gerandin. Li Stenbolê du şevên bi girseyî çêbûn.



Kurd ên di kampên derbendkirî de 3-4 seet be jî Newroz bi ahengek mezin pîroz kirin

Li gel hemû êriş û tedbîrên eskerî yê dewletê gel, cardin jî agirê Newrozê gurrtir kir, Newroz bi girseyî pîroz kir.

Li Diyarbekirê li Unîversîta Dicle nêzî 5 000 xwendevan civiyan û Newroz pîroz kirin. Xwendevanan agirekî mezin dadan û li dora vî agirî govend gerandin, sitran û marşên Kurdî gotin. Gişan bi hev re gotin "Bijî Kurdistan!", "Bijî Newroz!". Her wisa ji xwendevanan yekî li ser Newrozê û rewşa gelê Kurd a îro û êrişên dijmin axaftinek kir. Piştî vî xwendevan meşiyar ber bîna rektor. Li wir di navbera wan û polisên sivil de şer derket, xwendevanan polis kevîr kirin. Li kampa Diyarbekir multeciyan Kurd Newroz bi ahengek mezin pîroz kirin, lê dewleta kolonyalist piştî 3-4

seetan mudaxele kir û di nivî de birîn. Li alî din keçeke Kurd, xwendevana tipê Zekiye Alkan derket serê bedena Diyarbekir ala Kurdî bilind kir û agir bi xwe xist û got: "Êdî şewitandina dara têr nake, divê em xwe bişewitînin. Herçiqas keçik gihandin Anqerê jî, lê mixabin nefilitî şehîd ket. Li Stenbolê, li Unîversîta Teknikê, li Unîversîta Çukurovayê, li Unîversîta Erziromê, li Unîversîta Anqerê û li Unîversîta Egeyê jî xwendevanan Newroz pîroz kirin. Di demên van tevgeran de polis gelek xwendevanan girtin.

Li alî din, cardin li Stenbolê di 20 û 21'ê Adarê de Newroz bi du şevên gelek mezin hate pîroz kirin. Di her şevê de bi kêmasî 3000 kes beşdar bûn. Di şeva 21'ê mehê de dengbêja navdar Şîrînê jî

beşdar bû.

Newroz, li dervayî welat; li gelek welatên Ewropayê jî hat pîroz kirin. Li Londonê di 18'ê Adarê de ji alî Komela Karkirên Kurdistan ve, li Stockholmê di 24'ê Adarê de ji alî Federasyona Komelên Kurdistan ve, li Hambûrgê di 24'ê Adarê de ji alî Partiya Pêşeng, Partiya Gel, PDK-Iran û hin hêzên din ve, li Uppsalayê di 18'ê Adarê de ji alî Komela Kurd li Uppsala ve, li Norweçê; li Trondheimê di 21'ê Sibate de, li Bergenê di 23'ê Sibate de ji alî Komîta Piştigiriya Kurdan ve Newroz hat pîroz kirin. Bêyî van welatan Ewropayê, li Bulgarîstanê jî xwendevanên Kurd cara pêşî destûra pîrozkirina Newrozê girtin û 21'ê Adarê de Newroz li Sofiyayê bi şevê pîroz kirin.

## Konferansa Navnetewî ya Kurdistanê li Florensayê

Di rojên 23, 24 û 25'ê Adarê de li Florensayê konferansê bi navê konferansa navnetewî ya Kurdistanê çêbû. Konferansa bi inşiyatîfa Yekîtiya Belediyên Florensa û derûdora wê, UNICEF û Komîta Kurd li Îtalyayê pêk hat.

Di roja ewil de rojev pîrsa Kurd bû, li ser navê Cepha Kurdistanê Iraqê Mehmûd Tewîq, li ser navê TEVGERê İkrâm Delen û li ser pîrsa Kurdî di arenaya navnetewî de Fuad Huseyin, li ser pîrsa Kurdî û guhertinê de dawiyê li dinê Omer Şexmûs, li ser pîrsa Kurdistanê di raporên navnetewî de Kemal Keitly li ser rewşa Kurdistanê Cewat Molla, li ser navê Komîta Kurda li Îtalya Mirella Gal-

letî û li ser teror û işkenca li Kurdistanê Greta Arlon di li ser navê UNO-Swisre xeber da.

Di roja duduyan de, tema li ser "tarîx û kultura Kurd" bû. Di rojevê de 16 pispor li ser tarîx û kultura Kurdî peyivîn. Yê peyivîn ev bûn; Pelle Onorato, Kemal Mîrawdêlî, İsmet Şerif Vanlî, Kemal Fuad, Ferhad Fadîl Omer, Umberto Gorî, Anna Burciariellî, Ferhad Şakelî, Ezîz Eqrewî, Bextiyar Emîn, Ardiyano Arpago Novello, Alberto Burrollevî û Alberto Levi.

Di roja sisyayê de jî panelê çêbû. Di panelê de TEVGER, Cepha Kurdistanê Iraqê, Aleksandir Langer (Endamê Parlamentoya Ewropa (Grupa Kesk), Senator G.

Orlando (Demokratê Xristîyan), Senator P. Pierallî (Partiya Komunist) peyivîn.

Di dawiyê konferansê de biryar hat girtin ji bo ku komîsyonek were hilbijartin ku axaftin û raporên konferansê çap bike. Wê tede deklarasyonek Kurda û yek ji ya Îtalya li ser pîrsa Kurdî were weşandinê.

## M. Barzanî bi şevê girseyî hat bibîranîn

Li Stockholmê roja sisyê Adarê 11 sa liya wefata Mustefa Barzanî ji alî Partiya Demokrat a Kurdistanê Iraq (PDK-Iraq) ve bi şevê girseyî hat bibîranîn.

Di şevê de ji gelek aliyê ve bi dûr û dêrê-jayî li ser jiyana, xebat û têkoşina Barzanî hat rawestandin. Li alî din gelek nûnerên

## Li dinê ev meh

**YEKÎTIYA SOVYET:** Cotkarên Yekîtiya Sovyet ji niha û pê ve wê bikaribin bibin xwediyê bikaranîna erd. Xwediyê erdê de bikaribe erdê xwe wek mîras ji zarokên xwe re bihêle. Ev qanûna nuh ku ji alî Sovyeta Bilind ve hate qebûl kirin, ji bo tevayîya YKSS ye. Her komar wê li gor şertên xwe bikaribe vî qanûnê bi cih bîne.

**KAMBOÇYA:** Civîna li ser "aşti li Kamboçyayê" li paytaxta Endonezyayê li Jakartayê bêyî ku bigihîje netîceke belav bû. Di meha Sibate de Komîta Ewlekarî ya NY di civîna xwe ya Parîsê de biryar girtibû ku di helkirina pîrsa Kamboçyayê de NY rola xwe ya taybetî bileyze. Him hukûmeta Kamboçyayê û him jî hêzên li dijî hukûmetê ev biryar qebûl kiribûn.

**AFRİKAYA BAŞÛR:** Kongra Netewî ya Afrîkayê (ANC) di civîna xwe ya li paytaxta Zambiyayê, li Lusakayê de Nelson Mandela ji bo serokîtiya duemîn hilbijart. Serokê ANC Oliver Tambo ye û ev demek e ku ew li Swêdê di bin tedawiyê de ye.

**AFGANÎSTAN:** Wezirê parastinê ê Afganîstanê, General Şah Newaz Tanayî di roja 6'ê Adara 1990'î de hewil da ku derbek leşkerî biserxe. Lê belê Tenayî di hewildana xwe de bi ser neket û tevî malbata xwe reviya.

General Şah Newaz Tanayî li gor tê gotin endamê fraksiyona Xelk a PGDA (Partiya Gel a Demokratîk a Afganîstanê) ye. Tê gotin ku danûstendina Tanayî bi serokekî ji yê Mucahidan; bi Gulbeddîn Hikmetyar re heye û niha tevî malbata xwe li bajarê Peşawer e.

**FİLÎPÎN:** Di 4'ê Adarê de li Filîpînê li dijî serekkomar Korazon Aquino hewildana derbeke leşkerî çêbû lê bi ser neket. Serokê vî hewildana derba leşkerî General Rodolfo Aquinaldo bû. Heya niha 6 hewildanên derba leşkerî li dijî Korazon Aquino çêbûn.

**ŞİLÎ:** Diktatorê xwînşwar û faşîst ê Şiliyê, Augusto Pinochet di 12'ê Adarê de serokomarî dewrî serokomarê nuh ye ji alî gelê Şiliyê ve hatibû hilbijartin; Patricî Aylwin kir. P. Aylwin di hilbijartina meha Çileyayê Paşîn a 1989'an de nûnerê Eniya Hêzên demokrasîxwaz ên Şiliyê bû û bi piraniya deng hilbijartin qezenc kiribû.

**LITWANYA:** Parlamentoya Litwanya di 11'ê Adarê de serxwebûna xwe îlan kir. Ev biryar ji alî Moskovayê ve nehat qebûl kirin.

**YEKÎTIYA SOVYET:** Parlamentoya YKSS di 13'ê meha Adarê de bi 1771 dengen biryara ji holê rakirina pêşengîya PKYS'ê stend. Di roja 15'ê Adarê de ji Mixail Gorbaçov bi 1329 dengen bû serokkomar.

**IRAQ:** Rojnamevanekî Brîtanî -ku bi eslê xwe Îranî bû- Farzad Bazoft bi îdiaya "casûsî"yê ji alî rejîma Seddamê xwînşwar ve li Bexdadê hat bi darde kirin.

**ALMANYA DEMOKRATÎK:** Di hilbijartina parlamentoyê de li Komara Demokratîk a Almaniya (DDR) partiya CDU (Yekîtiya Demokratîk a Xristîyan) ji %41,16 û partiyên konservatîv DSU % 6,32 û DA ji % 0,88'ê rayan stendin. Partiya Sosyaldemokrat ji % 21,79 û Partiya Demokratîk a Sosyalîst (PDS) ji % 16,63'ê dengen stend.

**NAMIBYAYÊ:** Di 20'ê Adarê de ala Namibiyayê hat kişandin " serxwebûna Namibiyayê hat îlankirin. Namibya di sala 1915'an de ji alî Afrîka Başûr ve hatibû îşxalkirin.

hêz û partiyên Kurdan ji her wisa li ser Barzanî peyivîn, li ser wî û têkoşina wî dîtî û rayên hêz û partiyên xwe anîn zimên. Piştî xwendina mesaj û axaftinan li ser Barzanî filmek hat nişan dan.

Şev ji alî Komîta PDK a Ewropa ve hatibû amadekirin.



# Li ser pirsên sosyalîzmê munaqêşe pêwîst e

B. Hêvîdar

Kesên marksîst di analîza şertên welatê xwe û analîza şertên sosyal, ekonomîk û polîtîk ê netewî û navnetewî de divê ne romantîk bin. Îzahkirina bûyeran divê ne bi slogan û şablona be. Ji bo ku sosyalîst bikaribin li ser rewşa welatê xwe û li ser rewşa dinê analîzê ilmî bikin, divê objektîv bin. Bi saya van analîzên ilmî, sosyalîst wê bikaribin ji bo welatê xwe, xwedî program û projên realist bin. Dema ku îmkân ket destên van partiyên ku, li dijî zor û zilmê ne, ji bo sosyalîzmê, ji bo wekhevîyê û mirovatiyê têkoşînê didin, divê bikaribin program û projên xwe, li gor realîta welatê xwe, têxin jiyane. Eger meriv, marksîzmê wek teoriyek ilmî bibîne, wê ne wek tiştekî ji doxman û şablona pêkhatî nebîne. Divê him xwe û him jî bikaribe teoriya marksîzmê li gor şertên nuh û guherînan adapte bike, analîzên nuh ên ilmî çêke. Ji ber ku jiyana civakan û şert, li gor marksîzmê, li gor hinek teoriyan nayên guherandin. Van qanûnên ku civaka digehurînin qanûnên objektîv in li derveyî îrada merivan hene. marksîzm van qanûnan bi riya ilmî analîz û keşf dike.

Lê civak û pirsên wê gelek kompleks in, di jiyana civakan de guherandîna peyda dibin û pirsên nuh û bersîvên wê, wek formul ji berê de hazîrkirî tune ne. Wek her ilmî marksîzm jî divê xwe nuh bike, analîzên nuh çêke û bersîva pirsên nuh bide. Ji bo wê jî pêwîst e ku, marksîst xwe mahkûmê hin şablona û formulên nekin. Divê praktîka sosyalîzmê a 70 salan ji marksîstan re bibe tecrûbeyek giranbûha û divê ku em bikaribin jê dersan derxin. Lê perspektîva me divê tenê ne ew 70 sal be. Ew praktîk divê ku him jî aliyê negatîv û him jî, ji aliyê pozîtîv ve bibe referensên gelek hejra û bi qîmet.

Bi baweriya min, ne tenê ji şoreşên sosyalîst, lê ji şoreşên burjuwîa jî ku di fîrokê de pêk hatine, çî bi ser ketîbin û çî jî bi ser neketîbin, divê em bikaribin gelek tecrûbe û dersan jê derxin.

Piştî ku Mixail Gorbaçov bû Sekreterê Giştî a Partiya Komunîstê Sovyet û prosesa ku bi glasnost û perestrojka yê dest pê kir û hîn jî dajo, gelek bûyerên nuh anî holê. Hîn jî ne diyar e ku ev prosesa wê çawa xelas bibe, bi xwe re çî bîne î çî bibe. Di esasê xwe de hin tiştên ku bi xwe re anî û ên ku bir ji nuha de ji me ve xuya dike, lê hîn proses negihîştîye netîca xwe ya dawî yê. Li gor dîtina min li ber Gorbaçov du alternatîv hebûn. Ya wî yê siyaseta kevn bajota yan jî wekî ku kir, wî yê di sistemê de reforma bikira. Tiştên ku bala merivan dikêşe ew e ku gelek marksîst û dinya kapitalîsta bi hawakî gelek xurt piştigiriya Gorbaçov kirin. Piştigiriya marksîstan fahm kirin ne zahmet e lê a dinya kapitalîst hinkî zahmet e. Lê li gel wê jî dema ku meriv li ser piştigiriya welatê kapitalîst difikire, analîza sosyal, ekonomîk û polîtîk dike, digihîje qanaetkê. Welatên sosyalîst gihîştîbûn merheleyek wiha ku ajotina xeta kevn wê ew xelas nekirana. Ji aliyê ekonomîk, sosyal û polîtîk ve krîzek hebû. Ji aliyê ekonomîk û teknîk ve welatên sosyalîst bi welatên

Asya, yanî bi "dinya sisiyan" re muqayese dihat kirin. Welatên kapitalîst û emperyalîst analîzên gelek baş çêkiribûn û gihîştîbûn wê qanaetê ku polîtîka û xeta kevn a Sovyetê dikare hîn krîzên mezin bi xwe re bîne ku, ew jî jê zirarê bibînin.

Ji bo wê jî dema ku Gorbaçov bû Sekreterê Giştî û bi glasnost û perestrojka yê rê vekir ku sistemê bê reform kirin. Sistem, hewcedarî reformê bû û li ser vê rastîyê bawer dikim ku munaqêşe ne hewceye. Li vir tiştên ku marksîstan tespît nekiribûn welatên emperyalîst û îdeologên van tespît kiribûn. Ev jî ev bû, di sistemê de kêmasî û çewtîyên mezin hebûn. Yek ji vana, li welatên sosyalîst, hêzên komunîst bê hêz û bê bingeh bûn. Dema ku reform pêk bîn, azadî û demokrasî bi hemû xusûsiyetên xwe ve bê qebûlîkirin, hilbijartin ji bo parlamento bîn çêkirin, ji muxalefeta ne marksîst re musade bê kirin, wê demê wê sistemê têk biçe. Partiya Komunîst piştî 40 salî li DDR ji % 16 rey distîne (min ew jî bawer nedikir) Partiyek ku wê xwediyê ji % 16'ê dengan be û wê wêlatekî 40 salî îdare bike, ma ew ne neheqî ye? Li Polonya li Çekoslovakya, li Macarîstan û li Bûlgarîstanê rewş jî DDR ne baştir e.

Tespîten din ku marksîstan nedibû yan jî eşkere li ser munaqêşe nekiribûn, sistema Sovyet bû. Sovyet ji 15 komar û gelek herêmên otonom ve pêk hatîye. Navên sistemê federasyon be jî, di praktîkê de sistemên merkezi hatîye avakirin. Komar bi hemû tiştên xwe ve aborî, polîtîk û sosyal bi merkezi ve hatine girêdan. Welatê Baltîk (Estonya, Letonya û Litvanya) ji roja pêşîn de ye ku dixwazin ji Sovyetê veqetin. Sistema Sovyet gihîştîbû rewşek weha ku; ya wê bi darê zorê sistemê bidomînen yan jî wê sistemê reform bikin. Wek îmkânên sosyalîst, eger baweriya me bi azadiyê, bi demokrasîyê heye divê em li dijî darê zorê bin. Bi darê zorê ve sistemek nayê meşandin. Divê em her dem ji bo azadiyê û demokrasîyê û mafê mirovatiyê şer bikin, navê sistemê çî dibe bila bibe. Divê em sosyalîzmê bi karkir, gundî, ronakbîr, yanî bi merivên ku bi keda xwe dijîn ava bikin.

Li gor marksîzmê wê rojek bê, hemû dinya bibe komunîst. Ji bo wê jî du rê hene; ya bi rêya şoreşa sosyalîst (revolution) yan jî bi rêya evolutionê ve. Divê şoreşgerên sosyalîst, merhela evolutionê bi riya revolutionê ve wê prosesê xurt bikin. Dema ku ew dûzana komunîst pêk hat, wê li dinê netewe rabin, wenda bibin û bihelin. Enternasyonalîzm wê ava bibe. Sînor, dewlet, pasaport, millet wê li holê nemînin û rabin. Di nav miletan de entegrasyon wê pêk bê. Civakek nuh û dinyayek nuh wê peyda û ava bibe. Sovyet jî bo wê teoriyê di bahra kapitalîzmê de wek giravên nimûnê bû. Lê Yekîtiya Sovyet; ev girava nimûnê îro bi gelek problemên ciddî ve rû bi rû ye. Gelek komar dixwazin ji Sovyetê veqetin û Litvanya di vî warî de gawe konkret avêtîye. Di parlamen-toya xwe ya netewî de kesên komunîst û ne komunîst bi hev re biryar dan ji Yekîtiya Sovyetê veqetin. Vê bûyarê bi xwe re, pirsra qedera xwe

tayinkirin, di bin sistema sosyalîst de anî holê. Nuha marksîst û ne marksîst li hemû dinê wê pirsê û biryara parlamentoya Litvanya munaqêşe dikin.

Divê hêzên sosyalîst ên Kurdîstanê jî vê pirsê munaqêşe bikin û jê netîcan derxin, rewşa xwe zelal bikin.

Li gor bîr û baweriya min, ji bo netewtan qedera xwe tayinkirin heqêqî mukades e. Netewe divê bi xwe biryarê bidin, ewên jiyana xwe çawa bidomînin. Bi hev re jiyana jî, ji hev veqetandin jî, dibê ku bi awakî demokratîk pêk bê. Qedera xwe tayinkirin, ne tenê demek ku millet di bin nîrê kolonyalîzmê ya jî kapitalîzmê de ne heqek e. Netewe di sistema sosyalîst de bin jî, ji hev cihê bûn mafekî demokratîk e û divê bê munaqêşe bê qebûlîkirin. Divê sosyalîst wê prensîbê qet munaqêşe jî nekin.

Lê pir mixabin wek li hemû welatên sosyalîst li Litvanya jî tiştên dibin hemû ne pozîtîv in. Wek merivê baweriya wî bi sosyalîzmê heye, dilê min pê diêşe. Dema ku Litvanya yê biryar stand ku ji Sovyetê cihê be, berî her tiştî, li der û doran sembolên karkir û gundiyan, das û çakûç rakirin û wer xuya dike ku ew ên jî berên xwe bidin ber bi kapitalîzmê. Dilê min dixwest ku Litvanya dîsa di riya sosyalîzmê de problemên civaka xwe yê aborî, polîtîk û sosyal hal bike, ji wan re çaran bibîne.

Lê zefîketin û belavbûna Sovyetê wê bi xwe re çî bîne û çî bibe ev gelek muhîm e. Li gor baweriya min dema ku Sovyet têk biçe û hemû komar ji Sovyetê veqetin wê hêzên emperyalîst û kevnepereşt gelek xurt bibin. Hêzên militarîst wê li hemû derê dinê, hêzên gelên bîndest, demokrat û aşû-xwaz wê bi zorê têxin nav çemberê. Balansa dinê wê xerab bibe.

Ev nayê wê manê ku, emperyalîzm wê problemên navbera xwe çareser bike, di nav xwe de bikaribe dijîtiyê rake. Di welatên kapitalîst-emperyalîst de sê merkezen pirr bi quwet pêk tê: DYA, Japonya û Yekîtiya Welatê Ewropa.

Hêzên komunîst li Sovyet divê ji bo Yekîtiya Sovyet, civaka sosyalîst riyên nuh bibînin û peyda bikin. Yekîtiya Sovyet bi îrada miletan û bi riya demokratîk were çareser kirin.

Van problemên ku bi îrada miletan û bi awakî demokratîk hel nebe, gelek komarên din jî wê ji Sovyet veqetin.

Dema ku şoreş li Rûsya bû, gelek ne millet bûn. Prosesa miletbûyîna van komaran gelek di saya şoreşa sosyalîst de dest pê kir. Berî wê bi 70'ê salî qet tiştekî van miletan tunebû, lê îro, xwediyê gelek tiştan in. Prensîb û biryarên berî nuha bi 70'ê salî îro qîm nakin. Millet û civak pêş ve diçin û kompleks dibin. Lê cardin jî, civatek çiqas mukemel û demokratîk pêk tê bila bê, dema ku miletekî xwest, qedera xwe bi destê xwe tayîn bike û cihê bibe, divê ew bê qebûlîkirin, ew rê her tim vekirî be.

Bûyerên ku li welatên sosyalîst pêk hatin û dinê ser û binê hev kir, bawer dikim ku îro hîn zêdetir tê fahm kirin. Di ser bûyeran re 5-6 meh derbas bûne ya na, meriv kare hîn zêdetir hediseyê

Stiriyên me

Lawikê Berrivani

## "Evin hêdî here! Lampa sor pêket"

Gotinek meşhûr heye, dibêjin; "melê nezan meriv ji îmanê û doktorê nezan ji meriv ji can dike".

Baş e, lê çaxa mamoste nezan be çer dibe?

Bêguman mamostê nezan ne wek mele, zarokan ji îmanê dike û ne ji wek doktor canê wan digre. Lêbelê bi talîm û terbiya çewt dikare zarokan li hember civat û jiyane bi zanînen ne rast û çewt techiz bike û hetta, wan bişîne ser mirinê.

Wek dibêjin dereweke xwe bike û şahidekî xwe nişan bide. Şahidê vê iddia min ji kitêba "Em Bixwînin" e. Li ser başî û ilmîtiya kitêbê di pêşgotinê de wiha tê nivîsandin:

Ev pirtûk bi alikariya SIL'ê (Enstituta dewletê ya ji bo enformasyona navgînên hînkirinê) hatin amade û çapkirin. Ev cara yekemîn e, ku alfaba Kurdî bi riya **zebateke kolektîv** û her weha bi **metodên zanistî** tete amadekirin û weşandin. Di xebata vê pirtûkê de sê grûbên kolektîv xwedî par û bahr (par û bahr yek tişt in) in.

1- Grûba xebatê  
2- Grûba pedagojîyê û metodê  
3- Grûba zîmanê Kurdî  
Her sê grûb, bi awakî kolektîv û zanistî bi mehan xebitîn.

Nivîskarên kitêbê ev in:  
(Nesrîn Aydın, Jîr Rexnegir, Bares Batê, Bengîn Şirnaq, Reşo Zîlan û Hesên Mizgîn). Belê, di vê kitêba berhema xebata kolektîv û zanistî de, ku piştî xebatek bi mehan hatiye meydanê di rûpela 7'an de rîsmek heye. Di risim de du zarok li kêleka lampa tirafîkê sekinîne, dixwazin derbasî wî aliyê rê bibin. Di bin risim de ev tekst heye:

"Evin hêdî here! Lampa sor pêket".  
Bîra Evin hêdî here, ji bo ku erebe lê bi-qelibin, ji dê û bavê wê re bipelîxînin, bîkin nanik...

Lê a bi xêr ku heta nuha zarokên Kurd bi awê kitêba "zanistî" nekirine û çaxa lampa sor veketibûye "hêdî hêdî" xwe li ba nekirine û "neçûne". Û bi vî hawî, ji mirin û pelixandinê xelas bûne.

Ez bi xwe zû bi zû naxwazim ji zarokên xwe re bibêjim, mamostê we çewt gotiye ya ji tiştên di kitêbên we de şaş in. Lê belê di şîreta "Evin hêdî here! Lampa sor pêket" de min tahlûka jiyane dît (çend çewtîyên din hene ku ez li ser wan nasekinim) û loma jî mecbûr mam ku ji zarokên xwe re bibêjim:

"Nebî nebî, hûn bi a kitêba xwe bikin û gava lampa sor veketî be hêdî nerin! Çaxa lampa sor veket divê hûn **bisekinin**; kînga lampa kesk veket wê gavê derbas bin... Lê ji bîr mekin, di vir de jî "hêdî hêdî" merin; hîn hûn di orta rê de ne, lampa sor dikare cardin vêkeve...

Piştî ku min ev nivîs qedand, fena ku deh kes ji min re bibêjin "ji vê sibê de ye ku tu bi kitêba Em Bixwînin de ketiyî, tiştên wer hene ku dema tu wan bibînî tu'yê şekiriya xwe bi numûna "lampa sor" binî.

Tavilê min deng li zarokan kir, "hemû materyalên xwe yê Kurdî ji min re binin! "Piştî çavlegerandinekê ez rastî tiştên wisa hatim ku, bi rastî ji şîreta "Evin hêdî here! Lampa sor pêket" li ba wan wek gotinek weciz dimîne. Di nivîsa xwe ya bê de ezê çend numûnan ji ji wan bigrim dest.



## Lêkolîn

# Êl û Malbatê Kurd li Azerbeycana Rojava

-3-

## Perwîz Cîhanî

**8-Êla Şikak:** Ev êla ji mezintirîn û navdartirîn elêt Kurd e ku li Kurdistanê Tirkîyê dimînin. Êla Şikak xudanê silsila rêk û pêk a eşîretî ye. Ev êla bi ser du destên mezin par ve dibe: Kardar, û Evdoyî. Her yek ji van destan jî dibin çend taîfe bi vî cureyî:

Destê Evdoyî: 1- Pisaxayê Ma-la Elîxan 2- Etmânî 3- ..... 4- Şekirî 5- Çerkoyî 6- Nahmetî 7- Mendolekî 8- Mamedê Evdoyî 9- Keçelî 10- Kizînî

Destê Kardar: 1- Pisaxayê Mala Hesênê Reş 2- Mamedî 3- Delî 4- Fenekî 5- Botî 6- Xidirî 7- Nîsanî 8- Paçikî 9- Çergezî 10- Xelûfî 11- Gewrikî 12- Mûqrî.

Serokatiya êla Şikak hîn ji berê de heta roja îro di destê mala Elî Xan de ye li Azerbeycana Rojava ye.

Dibêjin ev êla di pêş de li Kurdistanê xwarê li rex çemê Padşahiye(?) dijîtin û paşê hatiye Îranê. Ev êla niha li sinorê Îran û Tirka li rojavayê bajarê Selmas û Urmiyê dijî. Hindik ji êla Şikak ji dewra hukumeta Qacar heta kutaya hukumeta Pêhlewî hemîşe û her tim li dijî dewleta nawendî ya Îranê rawestayê û li hember zor û zulma padişahan mêr-mêrane berberanî kiriye. Hegera yekê ya vê hindê ewe ye ku evê êlê çî wextê zulm û zor ne pesniyê û çî gava serê xwe li ber zorbêja xwar nekiriye. Hegera düyê ya dijiyatiya vê êlê li gel dewleta nawendiya padişahê Îranê kuştina bi necamêrane ya Cafer Axa kurê Mihemed Axa birayê mezin ê Simaîl Axa (Simko) bi dest Nîzam selteneyê Tewrîzê li gulîstan baxa vî şehîrî ye. Nîzamu seltene Cafer Axa bi mêvanî gazî kiribû Tewrîzê, lê bi necamêrî li ser masa firavîn xwarinê Cafer Axa û hevalên wî dabûne ber reşşîka û Cafer Axa ku hevalêkî wî tene kuştin, lê yê dimahî bi şer û rev mêr mêranî ji Tewrîzê derdikevin. Îsmaîl Axa bona vegirtina tola Cafer Axa çandîn cara êriş birin ser şarê Ecema yê Azerbeycanê. Dirîjîyîya van êrişane li kutayîyê de bû hegera daxwaza xudmuxtariyê ji layê Simaîl Axa. Pişka zor a qewmînet dewra Simaîl Axa di pirtûkê mêmîyî de hatine nivîsinê ku nivîsîna wan di vê gotarê de hilnayê.

Paşî kuştina necamêrane ya Simaîl Axa (Simko) bi destê serheng Newrozî û pîlana Timsar muqedem li bajarê Şinoyê,

serokatiya êla Şikak kete destê Emer Xanê Şerîfî.

Êla Şikak bi giştî dest ji koçeriyê kêşaye û xerîkî werzdarî û teşdaryê û dad û bistedê ne. Ev êla li navçet Somayê, Biradost, Kûrhesuniyê Selmas, Şipîran, Şînetal dewrûberê Selmasê, Enzel, Rewzeçay û Nazlûçayê rûniştine û pişkek zor jî li bajarê Selmas û Urmiyê dijî.

Taîfa Mendolekê Evdoyî ji êla Şikak jî li navça Elendê gundê Belesora jêrîn nav êla Mila dijî. Hindek jî li Kurdistanê Tirkîyê dimînin.

**9-Taîfa Pinyanişî:** ev êla li navça Şipîrana Selmasê nav Kurmancê werzkar dijî û pişka zor hê dibêjine wan jî Kurmanc. Bi giştî goteya Kurmanc sîber daye ser navê vê êlê jî û li navçê dibêjinê Pinyanişî yan jî Kurmanc. Pişka zor a vê taîfê li Kurdistanê Tirkîyê dijî.

**10-Kurmancê Şipîranê:** Kurmanc komekê zor ji Kurdan e û seranserî Kurdistanê xasma li Kurdistanê jorîn belav in. Ev koma Kurdan çûn xwedanê silsala eşîretê nînin ji layê dîtir eşîrên Kurd ve di dirêjaya mêmîyê de hatine zêrandin û zulm û zor li wan hatiye kirin. Û zor daran ji layê serok hoz û eşîrên kedxur ve hatine eşandin. Ev Kurmancane paqîştirîn ber û nijadên Kurdan e û baştirîn ji hemû Kurdan şiyane rewîşt û rê û resmê Kurdî yê xwe bi taybetî zimanê xwe yê zikmakî xudan kin û biparêzin. Gorekî hindek lêkolînan zaravê Kurmancê Şipîranê dewlementirîn û paqîştirîn zaravê Kurdiya jorîn e. Ji hemûyê girîngtir Ahamdê Xanî şair û zanayê payebilind yê Kurd ji temamê Kurdan re Kurmanc dibêje.

Kurmancê Şipîranê baştirîn werzkar in di navçê de.

**11-Taîfa Biradost:** Biradost navê taîfeyek mêmîyîna Kurdistanê ye. Emer Xanê Lepzêrîn ku çandîn salan di Kela Dimdimê de li dijî Şah Abasê Sefewî şer kir serokê vê taîfê bû. Nihe jî Biradostî taîfeyek mezin e li Kurdistanê Iraqê. Her ûsan Biradost navçeyek mezin û xoş e li rojavayê bajarê Urmiyê li rexê başûrê Somayê. Taîfa Biradostî ku li Îranê dijî di nav êla Şikak de belav in.

**12-Taîfa Dostkî:** Taîfa Dostkî taîfeke piçûk e ku ew jî binanî taîfa Biradostî di nav êla Şikak de belav in û şola wan jî

wek Şikak terşdarî û werzkarî û dad û bisted e.

**13-Taîfa Sarimî:** Taîfa Sarimî taîfeyek mezin e ji êla Milî. Milî ku Miliyê Kebir jî dibêjinê êlek mezin û navdar a Kurdistanê Jorîn e. Ev êla mezin xudanê zêdetir 40 taîfa ye ku Sarima jî taîfek ji wê êlê ye. Sarimî dibine çandîn tîre û malbat wekî: Balî, Kumnexşî, Serkurî û hwd.

Taîfa Sarimî li Îranê li navçet Elend û Kotolê belav in, li Kurdistanê Tirkîyê jî li navçet dewr û berê Wanê bi taybetî navça Ozalpê dijî. Serokê vê taîfê niha li Kurdistanê Tirkîyê Elî İhsan Begê kurê Osman Beg e ku zemanekî serokê temamiyê Mila dihate hijmarê. Ev binemale di gel binemala Smaîl Axa (Simko) xizim in û jin dane yek û din.

**14-Taîfa Şemsikî:** Ev taîfe taîfeyek mêmîyî ya Kurdistanê ye pişka zor a vê taîfê Kurdistanê Tirkîyê dijî. Tenê çend binemalên wê nav êla Milan û Kurhesuniyan belav in. Ev taîfa li ser êla Milî tene hejmartin û digel taîfa Merzikî xizmatiya wan a nêzik heye.

**15-Taîfa Merzikî:** Ev taîfa bi giştî li Kurdistanê Tirkîyê dijî tenê çend binemalên wê li Kurdistanê Îranê, li nav êla Şikak dijî. Taîfa Merzikî jî binanî taîfa Şemsikî li ser êla Milî tene hejmarê. Dibêjin ku herdu taîfên Şemsikî û Merzikî di pêş de wekî Kurden Dûnbilî û Mahmûdê li ser rêbaza Êzîdîyan bûn ku paşê bûne Misilman.

Taîfa Merzikî ji alî ciwanî (xweşikî) û bejna bilind û gerdana dirêj de bi nav û bang in.

**16-Taîfa Bayzîdî:** Ev taîfa ku di navçê de dibêjinê Bazîdî li Kurdistanê Îranê li navçet Elend û Kotolê belav in. Ev taîfa li ser êla Zilan in û ji navê wan diyar e ku binêşa wan dibe şarê Bayzîdî be.

**17-Taîfa Baxoşanî:** Ev taîfa çîçek çî taîfa Pinyanişî ye ku di navçet rojavayê bajarê Selmas û Urmiyê de belav e, pişka zor bi navê Kurmanc bi nav û bang in.

**18-Taîfa Hinare:** Hinare taîfeyek serbixwe ye ku li nav êla Şikak dijî û hindek daran xwe ji Şikak jî dihejmêrin. Lê ya rast ew e ku ev taîfa ji navça Hinarok ji Kurdistanê Iraqê hatine nav Şikaka niha jî zarav û devoka vê taîfê ne wekî devoka Şikaka ye. Ev hinde jî Şikaknebûna vê taîfê baştir dide diyarkirin.

**19-Taîfa Xelîfa:** Xelîfa li

rojavayê bajarê Selmasê dijî. Komek piçûk in. Ewana xwe ji toreme û bera xelîfê Raşîdîn dizanin û di navçê de xudan rêz û ihtiram in û ji rêkar û arîkariyên mezhebi yê xelkê derbasiyê dikin, zor jî dewlemend in.

**20-Seyîd:** Ev koma ji xwe nesla Hezretî Elî dizanin. Ewana di pişka zor a Kurdistanê de belav in lê li Kurdistanê Îranê pişka zor li navçet Mergewer, Tergewer û Deşt û Soma Biradostê dijî.

**21-Taîfa Dirî:** Dirî taîfek serbixwe ye ku li navça Biradostê û rojavayê Urmiyê dijî. Pişkek zor a vê taîfê jî li Kurdistanê Tirkîyê dijî. Karê pişka zor a vê taîfê terşdarî û werzkarî û dad û bisted e. Ev taîfa çîçek ji êla Zerza ye, devok û zaravê taîfê Kurmanciya jorîn e, lê zaravê êla Zerza ku li

Serhatî(Serhedî).

Her yek ji van destan jî dibine çandîn tîre û malbat. Êla Herkî pêş bi serketina şoreşa Îslamiya Îranê koçer bûn. Lê piştî bi serketina şoreşa Îslamî bo nealozîya navçê dest ji koçeriyê kêşan û li gund û bajarên cîwar bûn.

**24-Taîfa Alekanî:** Alekanî komek ji Kurmanca ne ku li nav êla Herkî dijî û binêşa wan gundê Alekan bûye ku gundeke li Gêdûka Qoşciyê nîveka bajarê Urmiyê û Selmasê. Xan Mahmûdê Alekanî di edebiyata folkloriya Kurdî de nîşana xiyaret û dexsiyê ye. Heman ew kesa ye ewê ku di şerê Dimdim de serekani nîşanî dijmin da û dexsê di gel Xanê Lepzêrîn kir. Di beyta Dimdim de heye ku dibêje :

"Xan Mahmûdê Alekanî,  
Nîşan daye serekani"



Huner panûsazbendên eşayirî

dewrûberê Şinoyê dijî Kurmanciya navîn e.

**22-Taîfa Begzade:** Taîfa Begzade taîfeyek ji Kurden jorîn e ku li navçet Tergewer û Deşt û rojavayê bajarê Urmiyê dijî û hindek jî li Gevera Kurdistanê Tirkîyê dijî. Di pêş de ev taîfe binanî pişka zor a Kurda koçer bû ku nihe hemû bi cîh û war bûne û xerîkî werzkarî û terşdaryê ne. Ev taîfa cîranê êla Herkî û taîfa Dirî ye.

**23-Êla Herkî:** Êla Herkî êleke pir heşîmet û bi nav û bang a Kurden jorîn e ku li sê welatan Îran, Iraq û Tirkîyê dijî. Ev êla di hersê welatan da baştirînê terşdaran e û cora pezê Herkî li Kurdistanê bi nav û bang e. Êla Herkî li Îranê di navçet Tergewer, Mergewer Deşt-Deştebêl, Begşilûçay, Barandûz û Rewzeçay li ser bajarê Urmiyê û Şinoyê dijî. Pişkek ji vê êlê di bajarên Urmiyê û Şinoyê de cîwar bûne. Êla Herkî bûye sê destê bi navên 1- Seyidan 2- Mendan 3-

Taîfa Alekan niha pişka zor werzkar in.

**25-Taîfa Zaxoranlû:** Ev taîfa komek ji taîfa bi nav û bang a Zohferanlûyê Qoçanê ye ku di dewrana Sefewiyan da çûne Xorasanê. Taîfa Zaxoranlû li dewr û berê Sayîndêj û Miyandiweyê dijî û şola wan terşdarî û werzkarî ye.

Diyar nîne ku ewane kîngê û çawa ji Xorasanê hatine vê derê. Tewawî Kurden wê derê(Miyandiwaw û Sayîndêj) bi Kurmanciya navîn qise dikin lê Kurden Zaxoranlû bi zaravê Kurmanciya jorîn dipeyivin.

Ev lêkolîn ji kovara "Sirwe" hejmar 39-40 hatiye girtin.

Nota Armançê: Azarbeycana Rojava beşek ji Kurdistanê Îranê ye. Tirkiye çawa Kurdistanê Tirkîyê bi navê "Doğu ve Güneydoğu Anadolu" bi nav dike Îranê jî Kurdistanê Îranê kiriye sê beş 1-Ostanê Kirmanşan 2- Ostanê Kurdistan 3- Ostanê Azarbeycana Rojava.



# HELEPÇE -BAJARÊ MIRÎ



Parlamentera Partiya Merkezê Ingbrit Irrhammar yek ji wan 5 parlamenterên Swêdi bû ku piştî du salan di nav kavilên Helebçe de geriya. Ew, wê tu carî bawer neke ku du sal berê li vî bajarê bê his û sir 50 hezar insan jiyabûn. (Foto: Georg Kristiansen)

**A** Ev Helebçe ye. Bi gotinek din kavilê Helebçe... Ji ber ku êdî Helebçe tune ye. Berî nuha tam bi du salan nêzîkî 50 000 mirovî li Helebçe dijyan. Îro jiyana li Helebçe nema ye. Ji derveyî çend kulîlkan, ku ji bin xerabeyan bi rik serê xwe billind dikin. Bêyî bebekeka naylon û çend bermayên din ên jiyane li derûdor belawelayî...

-Dema ku me Helebçe dit taya tirsê bi me girt. Bermayên merivan û hewrikên jiyane hê germ bûn, dibêje Ingela Martensson, parlamentera Partiya Gel, yek ji her pênc parlamenterên Swêdi yên ku di destpêka Adarê de çûn Helebçe û hin deverên din ên Kurdistanê Iraqê.

4000 hezar gundên wêrankirî, bi dehan bajarên xerabe, 2000 xwendegehên hilweşiyayî, niv milyon macir, bi hezaran kesên wenda, kesên idamkirî, kesên işkencekirî, kesên zindankirî li Kurdistanê Iraqê...

Listeyên bi dûr û dirêj, bi nav, bi cî, bi tarîx.

Ev liste ji rêxistinên Kurd, ji Amnesty û ji rêxistinên din ên mirovî tên. Van rêxistinên rêxistinên dixwazin raya cihanê ji JENOSIDA li Kurdistanê Iraqê agahdar bikin.


Gelo rastî çî ye? Tiştê ku li Kurdistanê Iraqê dibe jenosîd e, yan na?

-Bi a min, hemû pîvanên jenosîdê yên ku ji aliyê Amnestî ve hatine tesbîtkirin tên bi cih anîn, dibêje parlamentera Partiya Komunîst Berith Eriksson, întiba min a ji vê sefera Kurdistanê Iraqê ev e.

-Rejîma Iraqê împaratoriya tirsê ye. Tu kesê ku karibe li rejîmê rexne bigre me nedît. Tirs li her derê belav bûye, tirs di çavên insanên de tê xwendin.

Parlamenterên din jî di ditîna Berith Eriksson de ne. (Her çiqas meriv îro nikaribe ji sedî sed tesbît bike ku çiqas ji Kurdistanê Iraqê hatiye wêrankirin jî...)

Ragnhild Pohanka parlamentera Keskan dibêje, me li ser rîyan sed gundên xerabe dit.



Ragnhild Pohanka "Rejîma Seddam qebûl dike ku heta îro 300 000 Kurd ji gundên wan hatine derxistin. Ev hejmara resmî ye. Hejmara rast bi kêmanî du caran li vê ye. Hukûmet dibêje ku ew, vî tiştî ji bo Kurdan dikin. Ji bo ku jiyaneke "modern" û bidin wan." (Foto: Georg Kristiansen)

rabe dit. Bajarê Qela-Diza, ku demekê warê 50 000 kesan bû, ji bin ve hilweşiyayî bû. Gundiyên Kurd ên ku li ser axeka avî, di nav sinayî, fêkî û zêzewat de di-



jiyan îro bar kirine deştê. Li ser axeka bejî dijîn. Bê av û bê çandinî. Rejîma Seddam xelkê xwe mecbûrî xelayê dike, digel ku ne mecbûr e wisa bike.

-Rejîma Seddam qebûl dike ku heta îro 300 000 Kurd ji gundên wan hatine derxistin. Ev hejmara resmî ye. Hejmara rast bi kêmanî du caran li vê ye. Hukûmet dibêje ku ew, vî tiştî ji bo Kurdan dikin. Ji bo ku jiyaneke modern bidin wan.

Parlamenterê partiya sosyal demokrat Hans Goran Franck dibêje ku:

-Pirsên me yên li ser girtiyên bê bersiv man. Berî çuyina me, soz dabûn ku ew ê bi kêmanî du girtîgehan şanî me bidin. Me navên kesên idamkirî û navên hin girtiyên dan wan û li ser wan aqehdarî xwest, lê mixabin em bê bersiv hiştin.

Iraqîyan sozên xwe yên din hemû bi cih anîn. Delegasyonê Swêdiyan di-karîbû her kesê ku dixwestin, yan her cihê ku xwestin bibînin, ditin.

Ingbrit Irrhammar, parlamentera Partiya Merkezê dibêje:

-Lê, Îstixbarat li her derê û her gav hazir û nazir bû. Ji me her yek du sixur dabûn kêlekê. Yek li milê çepê, yek li milê rastê. Û tercuman jî pirê caran çewt werdigerand.

-Carekê ez pir hêrs bûm, min ji sixuran re bi keyd got "wê de biçin!" Bi tenê du mîtroyî wê de çûn.

Ragnhild Pohanka dibêje:

-Dema em çûn Helebçe 20 taksiyan dan dû me. Hemû leşker, sixur û polis bûn. Me tu carî nikarîbû yek mirovek ji bi serê xwe bidîta.

-Min û hevaleka ji delegasyonê xwest ku ji xwe re bihnekê li Bexdayê bi serê xwe bigerin. Piştî seetekê dora me tije bû. Em tenê sê kes çûn Qela-Diza, neh taksiyan dan dû me.

Delegasyonê parlamentaran, gundên Kurdistanê û yên Romanyayê didin ber hev. Dibêjin li Romanyayê bi tenê çend gund hatibûn xerakirin lê masmediya dinyayê gelek cih danê. Lê wêrankirina Kurdistanê bala tu kesî nakişîne.

Kurdistanê Iraqê wêrankirina dibe. Parlamentêrên Swêdi jî bi çavên xwe ditin. Ev şahidî, berpirsiyariyeka mezin davê ser milê hukûmeta Swêd? Gelo ewê hukûmeta Swêd (û ya Amerîka û ya Sovyet û ya Fransa, Almanya, Ingilistan û hwd...) berpirsiyariya xwe bi cih bînin in? Gelo ewê sibê indî wê ne dereng be?

**Eşref Okumuş**



Nadîr Kerîmovîç Nadîrov:

## "Li ber ba çûne"

Di platforma Partiya Komunîst a Yekîtiya Sovyet de, li ser pîrsa milî de gotin ku "di warê qanûnê de, divê mafên milî yên gelên ku di heyema Stalîn de destdirêjiya mafên wan hatibû kirin, bête tespît kirin. Pêwîst e hemû tedbîr bêne stendin da ku problemên Nagorno-Qerebax, Teterên Qırımê, Almanên Povolsiyê, Grekan, Koriyan, Tirkên Mîsket û yên din çareser bibin. Û ez bi xwe, ji xwe dipîrsim; gelo "yên din" kî ne? Hin ji me bi te-cruba xwe dizanin ku ew kî ne. Hin di heyamê xwendina dibistanê de, Grekî, Tirk û Teter bi bîra wan tên. Lê em bêjin Kurd. Gelo ew kî ne? Em çî li ser vî gelê ku wê bêyî wî "stûnek ji xaniyê me kêm be" dizanin? Li ser pîrsên muxabîrê rojnama me ("Komsomolskaya Pravda" B. Vişnevskî) Organa Rêxistina Xortên Sovyetê Akademîkê Akademiya Îlmî ya Komara Kazaxîstanê Nadîr Kerîmovîç Nadîrov bersivê dide:

**Pirs:** Nadîr Kerîmovîç, ez dibêjim Marks ev peyv gotiye; nezani hêzek şeytanî ye ku ya gelek trajedî jê dertê. Nezaniya di pîrsa milî de, rastiya vê gotinê da xuyakirin. Nimûne ji me hemûyan re nas in. Heger em hinekî ronakbîr bûna, êdî gelek tiştên qewimî, wê nebûna. Ezê ji xwe dest pê bikim. Ez çî li ser gelê we dizanim? Ew wêneyên rengîn ên ku min di kovara "Veknuq Sivêta" (Hawîrdora Cîhanê) de dîtî ku xelk bi kincên Rojhilatî yên seyr in û nivîsa di bin wênan de "Kurd miletek in ku mijûlî xwedîkirina pez û dewaran dibin, koçer in tene ber çavên min û jê pê ve?"

**Bersiv:** - Rast e, ji me hinek hene ku pez xwedî dikin û hinek hene ku şair û şervan bûn, lê belê miştextî, me ne bi riza xwe bi-jart. Ez wek nimûne; di pênc saliya min de, damxa(muhra) surgûnê li min ket. Bifikire. Sal, sala 1937'an gundekî windayî. Malek ji neh zarokan(piçûkên wan sê salî) û dayikek ne xwenda. Rojêkê destê sibê, kesên bi qapûtên leşkerî digrin ser gund û emir didin ku divê berî rojava gundî li ser bîrê bicivin. Bêyî ku em mebesta fermanê fahm bikin, her kesî li gora kirina xwe, malên xwe xistin çewal û boxçikan... Em hemû merovên hev bûn, lê li ser rîya ku niv salê kişand, em hemû ji hev belav bûn û me hev û du wînda kir.

Dûre, em li bestekê danîn û gotin; di çadir û konan de bijîn. Me xaniyên ji keviran ava kirin û paşê gundê bi navê Bûdyonî li ser rûyê erdê çêbû. Lê celîkirina(sirgûnkirina) gelê min ji bo rejîma Stalînî hindik bû. Şevêkê nivê şevê hemû malên Kurdên sirgûnkirî bêserî kirin. Çi bav û kurên mezin ên ku mabûn, birin û ew nema li malên xwe vegeyriyan û kesî nema ew dîtî...

**Pirs:** Lê, we çilo xwendina xwe bire serî? Ez dibêjim, mirovên mîna we, di wan salan de, dibûn alav ji bo propaganda resmî. Da ew bêjin; binêrin akademîkê me ji kîjan çîne ne! Ew ji belen-gazan û ji miletê herî piçûk in û xwedî maf in!

**Bersiv:** Erê, her miletek li gora xwe xwedî hin kerameta ne, lê ji bo diyarkirina wê yekê şertên taybetî divên. Lê belê, ji bo min silsila lihevhatinê yarmetiya min kir. Pêşiyê birayê min ê mezin Enwer, ji min re bû alîkar. Bala wî gelekî diçû ser xwendinê. Da

ku desthelat pê nehese bi dizîka dixwend û mamostayiya min û zarokên din dikir. Bi vî hawayî em hînî xwendinê bûn. Min ev dibistan xilas kir. Lê minê çilo bikaribûya hîn bêtir bixwenda, çimkî derketina ji sinorê herêmê ji me re qedexa bû! Vêga, tenê mamosteyê mezin dikaribû bibe alîkarê min. Û min namek ji Stalîn re hinart. Wî miletek wê-ran dikir, lê carna xwe bi dilovanî dida xwiyakirin. Nimûna keça Bûryatî (Bûryatî miletekî piçûk e, li Bakurê Sovyet dijî), tiştêkî ber bi çav e; Wî, ew tîr xelat kir, lê di eynî wextê de fermana kuştina bavê wê da. (mebest li ser keça komîsarê Bûryatî-Mengolî A. A. Marleizeve) Wilo jî wî, ji aliyekî rehma xwe li nasiya beriya Kazaxîstanê kir û ji aliyê din ve, gelê wê di ber bê berda. Bi vî rengî, piştî niv salî, min îzna xwendinê stend. Lê belê bi wî şertî ku ez li paytaxtan nexwînim û ji çerçeva biryarên ku di vî warî de hatine stendin, dernekevim.

Ji bo min, silsila lêhatinê dirêj-tir bû. Li bajarê Kizil Ord Instî-tûta Pedagojî hîn mabû. Bi xwe tenê ev şans li ber min ma bû. Buhara 1944'an bi hinartina kaxezên xwe, her roja ez diçûm nik kumandar û min pîrsa hatina bersivê dikir. Lê min xeşimê Xwedê, ji ku dizanî ku dokumentên pêşî ji nahiyê wê herin qaymeqamiyê û dîre wê herin Alma Ata û Moskova! Wilo jî divyabû yeko-yeko bihatana heya li min vegeyriyana. Helbet ji bo dayîna imtîhanê, ez dereng ketim. Û ezê dest vala bi-hatima malê, heger ez pêrgî(ew jî

**Lê celîkirina(sirgûnkirina) gelê min ji bo rejîma Stalînî hindik bû. Şevêkê nivê şevê malên Kurdên sirgûnkirî bêserî kirin. Çi bav û kurên mezin ên ku mabûn, birin û ew nema li malên xwe vegeyriyan û kesî nema ew dîtî...**

lêhatin bû) merovê ku tîkiliya wî bi meqamê rektor re bi awakî hebû, nehâtibûma. Ew jî ji kesên ku "xezeb li wan bariyabû" Wek di-bêjin ji bo mervantiya hev rewşekê, ew ji min re bû alîkar û ez ji devê gur derxistim.

Lê belê, piştî ku min bi serkeftin instîtut kuta kir, muwafaqa

Wî çilo wek serokekî leşkerî û muhafizê Îslamê deng dabû, wilo jî ronakbîrî diparast û bi pêşde dixist. Û kêm kes dizanin ku Nizamiyê Mezin jî niv Kurd bûn. Şairê Serdema Navîn Ehmedê Xanî yê ku akademîk Orbelî maqamê wî gelekî bilind dît û xiste rêza Firdewsiyê Îranê û Rusteweliyê Gurcî, kêm kes li cîhanê wek

Hejmara Kurdan bi awakî kadas-trofî kêm dibe. Û ku bawerî bi îstatîstîka sala 1979'an bê, êdî hejmara Kurdan li Azerbeycanê dighê reqama sifrê. Tabloyek mûmasil li Komarên Pişkafkê û Tirkmani-yê cî dibin. Di salên 20'an de li wan Komran nêzî sêsed hezar Kurd dijiyan. Lê di salên 30'de ew ketin xana " û yên din". Lêbelê li



**Nadir Kerîmovîç Nadîrov: "Ji bo parastina xwe, wek miletên din ên piçûk, divê Kurd xwe bikin yek û niha ew vî tiştî dikin".**

xwendina doktora nedan min. Ma wê kê îzna çûna paytextê bida min? Êdî min dest bi mamostetiya dîrsa kîmya li nahiya Çulak Tay kir, lê bêyî stendina mafên ewilî emnî ez dibêjim bi vî axaftina dirêj ya li ser rewşa xwe, min bersivê pîrsa "akademîk ji ku derketin" jî da. Lê helbet, çilo ku tiştên awarte diqewimin, wilo jî yên ku bi riyên normal jî dibin, hene.

**Pirs:** Nadir Nadirovîç, ez pê dizanim ku dîroka miletekî di paragrafê de hilnayê, lê tevî wî-haye jî, ji kerema xwe re ji min re bêje; Kurd li ku hene û ji ku hatine?

**Bersiv:** Kurd yek jî gelên Rojhilatî yên kevnare ne û jiyaneke aktîv li bakurê-rojava yê Asiya dijiyan. Lehengê şerê bi Xaçperestan re; Selhadîn Eyûbî Kurd bû.

Kurd dinasin..

Rojnamevaniya Kurdî li Stenbolê, Qahirê, Petersburgê, Londone û Cenewrê dihate weşandin. Û ev ne tiştêkî seyr e, mana hejmara vî miletî li cîhanê (bi taybetî jî li Tirkîyê, Îran, Iraq û Sûriyê) ji 22 milyonan heya 25 milyonan e...

**Pirs:** Û li Yekîtiya Sovyet?

**Bersiv:** Li vîra, li gora rewşa siyasî hejmara wan dihate guher-tin. Tu bi xwe hukum bike. Sala 1923'an, li Azerbeycanê herêma ku Kurd tê de li ser hev bûn, hejmara wan 46 hezar bû. Bi daxwaza Lenîn otonomiya Kurdî tê damezirandin. Lê dîre dibe Kurdistaneke Uyezde(Herêma Kurdistanê) û paşê statûsa wê kêm-tir dibe û dibe Kurdistankî Okrik. Di sala 1930'an de bêyî biryareke resmî ev yekîtiya îdarî wînda dibe û navê "Kurd" di dan û stendinê de radibe.

gora îstatîstîka sala 1959'an hejmara Kurdan li wan herêman nêzî 58 hezaran bû. Û niha, li gora îstatîstîkên resmî yên sala 1989'an, Kurd 152 hezar in...

Heger ez hîn bêtir li ser rewşa miletê xwe bipeyivim, wê nebe ku êdî gotinên Akademîk Orbelî yên kovanî bi bîra xwe neynim! Wî di heyamê xwe de nivîsandibû: "Vî miletî gelek lawên xwe di bin navê Faris, Erebb û Tirk û Ermenan de wînda kirin. Kurdan kur-rên xwe wînda dikirin û dîroka gelên din bi wan dixemilandin."

Mana gotina "Kurd" bi mebesta "li ser hev, yek dest" tê, lê ji ber pêkenîna qedere miletê min, weka li cem me dibêjin bûye mîna noka ku tu li tehtê xî..."

**Pirs:** Nadir Kerîmovîç, dem moralê gelan bi temamê digu-



# ŞIKESTİN

1

Haho hawar e, werin hewar e!  
Ev qêrîna ha, mîna bagerê li  
gundên serê çîyan belavkirî, li  
nav eşîra Zozo, ji ciyekî çû ciye-  
kî û belav bû.

Zozo fermanrewayê wê cîhana  
Kurdî ya piçûk û aza bû, ku ko-  
pên çiyayê Dêrsimê yê dijwar  
hembêz kiribûn û li jêr di bin  
mezîniyaya baskên xwe de, çîya,  
geliyên bêbinî, ji xwe re kolekirî,  
li pey xwe hiştibûn.

Hê- hê- hê- Zilxfefarê dujmin,  
bi peyayên pir, berê xwe daye  
milk û malên eşîra Zozo: Şer îlan  
bûye.

Ma ji bo çi, gernas dê li ser  
rûyê erdê bijî, heger şîhîna hespên  
dijmin li ber deriyê mala wî bê!  
Heger keçên eşîra wî çirûsîna  
şûrên neyaran bibînin?

Di hundirê rojekê de bêdengiya  
çîyan şikest û tu dibê qey kopên  
paye û bêcir biruhên xwe bi jêr ve  
berdan, xwe mad tal û zivêr kirin.  
Devî jî mîna ku hefsar ji qama  
xwe re berdîn, bilind bûn û latên  
tûj da ku li hemêbrî nexêrê rawes-  
tin, bi minetavêtin, xwe gincir  
kirin. Taya cengê girte ser newa-  
lên kûr û rêlan û dar hejandin.

Li ser baniyên xaniyan duxanê  
nema ulor kir û jîyan li gundan  
rawestiya. Zilamên ku hêl di wan  
de ma bû, haziriya xwe û şer ki-  
rin. Heya şivanan jî, keriyên xwe  
kirin ber zarok û pîrekan, vege-  
riyan gundên xwe û xwe xistin bin  
darên çekan.

Li malan tenê îxtiyar, pîrek û  
zarok man. Xwişkan çekurê çaro-  
xên birayên xwe nerm dikirin,  
barûd û gule ji wan re hazir diki-  
rin. Herçî siwarên egîd, awirên  
xwe davêtin geliyan, tozê ji ser  
şûran û zengê ji ser tivingan paqij  
dikirin. Û niha jî çûna pêşîya dij-  
min diviyabû, çiqasî zû bûya, wi-  
lo baş bû.

- Emê xwîna Zilxfefaran vex-  
win! Emê ji termên peyayên wî,  
wek pelên çilo yê weşiyayî ge-  
liyan dagirin!..

Şervanan bi qêrîna xwe erd û  
esman dihejandin. Çek di destên  
wan de, hesp zengo dikirin û bi  
lez berê xwe didan şer.

Êdî çûkekî li serê çîyan jî  
nema karibû bifiriya, çimkî her  
dever jê re bûbû tehlûke.

Pîrekan li ser baniyan xaniyan û  
keçikan li ber deriyên, bi çavên  
melûlî dildarên xwe bi rê dikirin.

Şervan mîna ku herin dîlanê  
diçûn şer, piçîka tirsê di çavên  
wan de tunebû.

Xwelî li serê wî be, yê ku bi  
paş de vegere?

2

Û serok vaye: Zozo ji serê xwe  
heya nigên xwe, bi tiving û rex-  
tan rapeçayî, boxçik ji destê ber-  
devkê xwe girt û ji malê derket.  
Zozo bi gewdê xwe wek dewekî  
bû bi pûrt û serê wî mezîn bû.  
Rûyê wî xezab û meznahî jê diba-  
riya. Ew bi temen bû û por sipî  
bû, lê bi liva xwe hîn sivik bû.

Zozo, bi girtina çavan, lingên  
xwe xist zenguyê û xwe avête ser

Çîroka "Şikestin" a nivîskarê Ermenî Rûben  
Zardaryan e. Ew di sala 1878'an de ji dayika  
xwe bûye û di sala 1915'an de bi destê  
hukûmeta Tirk hatiye kuştin.

Li gora ku tê gotin, Rûben Zardaryan dixwest  
mijûlî çîrok û destanên Kurdî bibe, lê mixabin  
mirina bê wext rê li ber vî tiştî girt.

Çîroka "Şikestin" ji ber diploma Efganê  
Evdalî, me ji zimanê Rûsî wergerand Kurdî.

Efgan ji Kurdên Sovyet e û kurê nivîskarê Kurd  
Eminê Evdal e. Wî sala 1927'an li Înstîtûta  
"Maksîm Gorkî" li Moskova nama maisteriyê  
parast. Bi xwe wergera çend çîrokên nivîskarên  
Ermenî ji bo zimanê Rûsî tema diploma wî bû,  
çîroka "Şikestin", yek ji wan çîrokan e.

zîn. Peyayên di bin re mîna wî  
xwe avêtin ser hespên xwe û ra-  
westiyayî man. Ew li bendî mîrx-  
asekî ji yê eşîrê bû û çavên wî û  
şanazê rojê (Brahîm kurê Zozo) yê  
bi tenê man.

Vaye Brahîm, xortê bejin dirêj,  
sîngfireh, di buhara bîstan de, di-  
yar kir. Hezkirina mezin a yekcarî  
ya ku kopên çîyan ne dikarî ku-  
rekî wiha çeleng û lihevhatî çêke  
û şêra ku şîrê heft çelikan bide  
yekî, ne dikarî şêrekî wiha bîne.

Li gora adetên mîrxasên eşîrê,  
diviyabû ber bi bavê xwe ve here.  
Bi çûna wî awirên hezkirin û pê-  
weşiyê li ser rawestiyan û di wan  
çavan de, şanazîya ku dikaribû  
neyaran bibizdîne xwiya dibû. Bi  
xwe kes ji peyayên dijmin nedigih-  
han toza wî û nehêjayî nenûka wî  
bûn.

Diya gernaso- Xecê ji malê der-  
ket, da ku eniya kurê xwe maçî  
bike û bi dua wî bi rê ke:

- Kurê min, navê eşîra xwe bi  
qencayî derxe û de bila mîraniya  
te rûmeta warê me biparêze!

Zengo dikin şinge-şing û siwa-  
ran hesp li ser xaçerêkan dibezan-  
dîn. Rep-repa bi dûrketî ya nigên  
hespan fiz-fîza zuxurên ku ji ne-  
walan ji ber wan radibûn, dihat.  
Mezinahî û spehîbûna mîrgên  
van çarnigên aza û kefa ji ber ge-  
man, ji devan kefî, mîna xwediyê  
xwe, xeydê ew digirtin û bi firê-  
fir bihn ji firmikên pozên xwe ber-  
didan. Şehîna hovîtiyê, olana çav  
li xew, li çîyan diqelaşt; caniya  
ku di nav gîha bilind de, ji nişka  
ve li ciyê xwe sar dima, serê xwe  
bi jor ve dikir, pêjna tuxmê xwe  
dikir, bi heyecan dihiya, çî ji dûr  
û çî li hawirdorê bi hîre-hîr lê ve-  
digerandin.

Çilo siwar, wilo jî hesp serx-  
weşê bendewariya nêzikbûna cen-  
gê bûn, li bendî stendina tolê  
bûn.

3

Ox, çawa daristan, dema ku şer  
bi şerkokên xwe ve jê dertên, bê  
xwedî û tenha dimîne, wilo jî  
gundên Kurdan sêwî dibin, pêla  
zilam ji wan dertên, pîrek û zarok  
bi tena xwe dimînin! Kundê bêqi-  
doş li ser lûlên soban, li ser ba-

nan hilar dike. Û dayikên ji kerba  
nîvmirî, li bendî kurên xwe  
dimînin, an çavên wan li qulikên  
bi xwîne ku keçikan ji wan re  
dirûtibûn, digere; gelo ewê nema  
dengê seravêtina "lawo" li ser  
zarokan ji nav daristan û çîyan bê.  
Li bendimayîna nûçekê ji meyda-  
na cengê êş û derd e û li çîyan ev  
tişt girantir e û nayê hilgavtin.  
Biçmên pîrekan, ne ji ber wînda-  
kirina komirê û hezkirinê tîrş û  
tal dibin. Na. Ji ber ala  
şikêndandinê û pîskirina rûmeta êlê  
û nîfşên nûhatî, rûçikên wan reş  
dixeniqin. Ji ber vî tiştî tevzînok  
bi laşê wan dikevin.

Ne dîr e, bi elindê, dê miz-  
gîniya xêrê bêt.

Ji hemûyan bêtir jina serok-  
Xecê, bi dilêş li bende dimîne.  
Êşa wê bêtir kûr û dijwar e, çimkî  
divê ew di xwe de dernexe. Dilo-  
vaniya dayikîtiyê, hezkirin û nêzi-  
kî, divê di dilê wê de zuha bibin,  
mîna ku li Sehyayê bîr zuha di-  
bin. Ji ber ku çavên hemû jinan  
lê ne û diyarkirina lawaziyê ji  
rexê wê ve wê qebûl nekin.

Roj ber bi êvarê diçe. Siya ta-  
riyê hedî-hêdî, ji geliyan, bi jor  
ve, evraz û evraz bi alî kopên  
çiyayên bilind hildikişê. Di nav  
zêviyên genim û garisan de sira  
bayê êvarî dilîze. Awir bi asoy û  
serên çîyan ve girêdayî ne, jina  
serok li benda mizgîniya xêrê ye,  
yan jî gotina ne xweşiyê ye.

Oy, çî heyecanek bilind -stûna  
tozê li ser rê radibe! Şervan vedig-  
erin. Ma kengî, dê kurê wê, xeb-  
era serkeftinê ya şêrîn bi xwe re,  
jê re bîne?! Oh, wê çî şanaziyek  
mezîn bûya! Wê kurê xwe hem-  
bêz bikira û çekê wî yê ji pola tîr  
ramîsan.

Ji ber xezaba harbûnê û  
xemgîniya bêhêvî, hinarikên rûyê  
wê sipîçolkî be, ber çavên wê reş  
bin û diranên wê dikin çirke-çirk  
Nûçe giro bûn.

4

Roja din, kêlika tariya şevê  
girte ser rûyê erdê, çilo Zozo wilo  
jî eşîra wî, di cengê de bi  
şikenandinek bê vege xesirîn. Li  
her deverê term ramedandî bûn,  
termên şervanên herî bêtirs...

▲ Rûben ZARDARYAN

▲ Wergêr: Bavê NAZÊ

Egîdên Zozo pirê caran êrîş dibi-  
rin ser dijminan, lê çî cara heye,  
şikestî vedigeriyan. Rewşa çetin,  
rêza şervanan ji hev dixist " giya-  
nê gernasan lawaz dikir û dijminê  
xwedî hêz, wexta xwe bi derewa  
wînda ne dikir, her rê nedida wan  
û li ber wan teng dikir. Hema ku  
ceng lal û zîz dibû, pêre-pêre, ji  
rexê dijmin çariya pîrekan bi serê  
şûr bilind dibû " bi awekî pêkenîn  
kesên di kozikên pêşî de bang di-  
kirin:

- Hê şervanên Zozo! Heger hûn  
ditirsîn û nikarin mîna mîrxasan  
şer bikin vaye, ji we re destmala  
pîreka bidin serên xwe...

Ev loma ha ji bo şervanên  
Kurd, îxanetek mezin bû. Ji ber  
vê çandê wan xwe dîsa diavêt agî-  
rê cengê. Careke din şûr diketin  
nav hev û careke din serî difiriyan  
û şervanên berxwedayî bi hama  
xwe diketin erdê germ. Lê herçî  
xwedî tecrube bûn, wek kewan,  
pirê caran, ciyê xwe duguheztin...

Careke din bêdengiyê konê xwe  
berdida û dîsa çariya jinan bilind  
dibû û careke din dengên kesên di  
çepera pêşîn de dihat:

- Hê, Zozo, kî nanê eşîra te  
bixwe, wê bibe pîrek! Bi mîrxasî  
were cengê! Heger tu nikarî, kolo-  
zê xwe ji serê xwe bikî û vê  
çariyê bide serê xwe!..

Bersîva vê yekê, dibû fiz-fîza  
gulan, çîrûskên agirên wan ji ke-  
viran diçûn.

Bi van îxanetan, bi harîtiya  
pîlîngê birîndar, Îbrahîm êrîş bir  
ser kozikên neyaran. Ev mîrxasî-  
yek bêhempa bû û karekî le-  
hengî bû.

Rêzên hesnî bi paş de vege-  
riyan, tirsê hinekî xwe girt ser  
şervanên dijmin û ji ciyên wan  
dengê stendina tolê bilind bû.

Û dengê ji dîr ve hat ku  
Îbrahîm hate kuştin.

Şingîna şûran, qêrîna serkeftin  
û şikenandinê wek olanê di mîja  
tariyê de li hev vedigeriya heya  
Zozo û eşîra xwe, ji derbên dij-  
min ji ber hev ketin û ji ber kuş-  
tina Îbrahîm ji qada şer derketin.

5

Li çiyayên Dêrsimê, bêdengiyê  
girte şûna şûm û qerebalixê û  
piştî ku rep-repa nigên hespên re-  
viyayî bi dûr ketin, teqîna tivin-  
gan û şinge û şinga şûran jî  
nema hat. Tariya şevê kesên re-  
viyayî yê serkewî daqurtand. Lê  
tenê birîndar, xwe bi xwe bi şevê  
re man.

Zozo, bi tenha xwe, ser çar-  
lepkan, bi destpelandî rê di nav ta-  
riyê de ji xwe re vedikir da ku  
xwe xilas ke. Ew direviya, lê ba-  
hoza lome û şermdariyê dida pey.  
Divê ew bireve, lê bi ku de, wî  
bi xwe ne dizanî. Berbang zû bi  
zû dê bê û bibe roj. Sibehê, dê  
herkes çavên xwe di yê xî xî û  
di wan de, ewê şervanê revok û  
lawaz bibînin. Û heya zarok, pêla  
di ber re herin, dê bi heqaret lê bi-  
nêrin û rûyên xwe jê bizivîrin.  
Kal jî wê serên porsipî tazî bikin  
û lanetê li bavê yê xirab bînin û  
pesnê kurê leheng bidin.

Bav direve, lê kurê gernas li ser  
latekî ji yê çîya, di xewa şêrîn,

xewa mirinê ya mîranî de wînda  
bûye. Mîrxaso razaye û ba bi  
pêşanika wî ya xelkelokî dilîze.  
Gumlekê wî yê sipî, tu dibê qey  
jê re bûye hîzarê kefen û termê wî  
veşartîye. Û di çavên wî de hiqdek  
pîrozbayî saz bûye.

Bav direve û siya law jê  
namîne; di nav daran de dide pey  
û wek olanê li guheran li hev  
vedigere. Siya kur bera dû bavê  
dide û doza ku ew vegere lê dike.  
Ew xwe davêjiyê, da ku ji rîya  
bêrûmetiyê ew vegere. Heger ser-  
kevîtin ne mimkûn e, vêga mirin  
hêsantir e û bi rûmettir e.

Êdî dereng e, qada şer li paş  
maye, tarîti sawa tirsê bi xwe re  
tîne, hêl nemaye û li ser serkevî-  
tinê, heya tefkîr jî nabe...

6

Destê sibehê, serok li ber deri-  
yê mala xwe sekinî. Li hewşê  
xulam û şivan hîn di xew de bûn  
û eba heya serê xwe kişandibûn  
ser xwe. Reyandîna sehan li gund  
belav dibû. Kûçikên gurxenêq, bi  
naskirina xwediyê xwe, teriya  
xwe hêjand û xwe avêt ber nigên  
wî. Zozo yê ji haw hawketî, nigê  
xwe li kûçikê li ber dilê xwe  
şêrîn xist û bi dizîka derbasî xênî  
bû.

Hîn doh êvarî, ew ji van deri-  
yan bi payetî derket, lê îro ew bi  
hustuxwarî û serî xûzkirî -hîn  
êvarî ew serî bilind bû û bi çavên  
bazan li kopên van çîyan ku ew  
xwediyê wan bû, dinêrî- lê îro,  
kovanî û ara revê bêhn lê  
diçikand.

Reyandîna kûçikan, xulam û  
şivan rakirin ser tapanan; gelo kî  
hat û çî mizgîni bi xwe re anî?

Serok bê hesp û bê peyayên  
xwe vegeyriya, çavên wî mişt  
xwîn bûn û ew bê deng bû...

Qêrîna waweylê û malwêraniyê  
bi malê ket.

Dê li ser kuştina kurê xwe gi-  
riya li ser mîrê xwe yê ku serkevî-  
tin dabû dijmin, şîni nebû. Diya  
dil bi xwîn qîriya, çariya xwe di-  
rand û porê xwe kişand. Ew mîna  
hemû dayikên ku bê law dimînin,  
girîya. Wê wek çavê însanê ku  
cara dawî ronîya rojê dibîne, hêsir  
barand.

Zozo ne dipeyivî û mîna bêhi-  
san dinerî bêyî ku bibîne, didît  
bêyî ku tiştêkî fam bike.

Serokê bêrûmetkirî, li ber xwe  
ketî, newala ku di nav wî û kurê  
wî de çê bûbû, dipîva û ew gîhaşt  
wê baweriyê ku barandîna hêsiran  
divê ne li ser kurê wî be, li divê  
li ser wî, bi xwe bêne rijandin.

Tîrêjên agirê êş û şermdariyê  
dane dilê wî; ew har kir û hişt ku  
ew rabe ser nigan. Wî li jina xwe  
ya bêhêl û ya ji urf û adeta der-  
ketî, da xencerê û tenê vî tiştî  
dikarî bû gunehkariya wî bişuşt.

- O, tu ne baş hêsiran li ser  
egîdo dibarîni!!

Û destê wî hukmê xwe da...  
Serokê eşîrê xwe di ser termê jina  
xwe ya di xwîne de vegevîzandî  
çend kir û ji malê derket. Kêlika  
çekê xwe da destê naşiyê li devê  
derî rawestiya, li ser kabokan,  
li ber rûnişt...

□



# Kurdistan rabû ser piya

Li dijî teror û zordariya nêdîf ya dewleta kolonyalist a Tirk, xelkên Nisêbînê, Cizîrê, Silopiyê, Mîdyatê, Idîlê, Derîkê, Kiziltepe, Mazîdaxê, Farqînê û Diyarbekrê bi tevgerên cur be cur serî hildan û terora dewlata Tirk bi tundî protesto kirin. Esnafan bi heftan dikanên xwe girtin, xwendevan neçûn mekteban, xort, jin, mêr daketin kuça û kolanan, zarok û xort bi tenekan û bîdonan barîqat danîn û bi kevîr û daran li hember êrişên leşkerên Tirk li ber xwe dan. Xelkê bi dengê bilind gotin "Bijî Kurdistan" "Bijî azadî û serxwebûn" "Bimre dewleta Tirk". Li Sêrtê, li Meletyê, li Edenê, li Anqerê, li Stenbolê û li gelek bajarên din piştgiriyên xurt ji serhildanan re hat nîşan dan.

## Întifada Nisêbînê

Di 12'ê Adarê de li qeza Sewrê li gundê Girêsrê 13 endamên PKK ji alî dewletê ve bi hawakî hovîti hatin kuştin. Ji wan yek, kurê endamê Meclîsa Beledîya Nisêbînê Yusuf Dundar, Kamûran Dundar bû. Di 15'ê Adarê de gava cenazê wî li Nisêbînê hat rakirin, leşkerên "Tîma Xusûsî" a Tirk êriş birin ser wan. Li ser vê êrişê di navbera xelkê û leşkeran de şer derket. Welatparazekî Kurd bi navê Şemsetîn Çiftçi ku hîn 19 salî bû bi gulên leşkerê şehîd bû. Bi dehan kes birîndar bûn û zêdeyî 300 kesî jî hatin girtin. Li ser van bûyaran xelkê Nisêbînê bi qehremanî li ber xwe da. Esnafan 3 rojan dikanên xwe girtin. Leşkerên Tirk bi tank, panzêr û helikopteran bajar kirin binê hesargê. **Întifada Nisêbîniyan** li qezayên din olan da.

Bajarê Melê Cizîrî û Mem û Zînê, welatparazên Cizîra Botan piştgiriyek bi mîrxasiyek bêhempa dan xelkê Nisêbînê. Li dijî leş-

kerên modern ên Tirk, tank, top, panzêr û tîmên wan ên xusûsî gelê Cizîra Botan ji 7 salî heta 70 salî, çî jin û çî mêr bi rojan bi bawerî û bi qerardarî serî hildan. Esnafan heftakê dikanên xwe girtin, xort û zarok bi teneke û bîdonan li kuçên bajêr barîqat danîn, li kuçan agir dadan, mala mebusê ANAP'ê Nuretîn Yilmaz dan ber kevîran, xesar dan daîrên dewletê, û bi kevîr û daran li dijî êrişên leşkeran li ber xwe dan. Di întifadayê de 5 welatparêz; Yusuf Şahîn, Salih Elçioğlu, Mehmet Yilmaz, M. Emîn Gun û zarokê 11 salî bi navê Abidin Tuncer şehîd ketin. Bi dehan kes birîndar bûn û zêdeyî 500 kes jî hatin girtin.

## "Em Azadiyê dixwazin"

Li ser kuştina van kesan zêdeyî 15 hezar kesî di 23'ê Adarê de meşek mezin çêkirin û bi sloganên "Bijî Kurdistan", "Em azadiyê dixwazin", "Şehîdên me namrin" û "Întifada wê dom bike" vê qatlamê bi tundî protesto kirin. Întifada xelkên Cizîrê gihîşt merheleyek bilind. Leşkerên ku Cizîrê kiribûn bin hesargê, çûyin û hatina Cizîrê qedexa kiribûn û li Cizîrê îdara orfî îlankiribûn li ber serhildana Cizîriyan gav paşde avêtin, bê deng man..

Întifada Nisêbînê û Cizîrê moralekî mezin da qezayên din yê Mêrdînê. Esnafên Idîlê, Silopiyê, Mîdyatê, Dêrikê, Qezê (Kiziltepe), Mazîdaxê li gel hemû tedbirên leşkerên Tirk bi rojan dikanên xwe girtin û bi vî hawî nefret û kîna xwe ya li hember êrişên dewletê anîn zimên.

"Întifada", tenê li qezên Mêrdînê nema, pêla wê gihîşt Farqînê û Diyarbekrê. Di 28'ê Adarê de bi însiyatîfa hevalbendên **Partiya Pêşeng** li Farqînê esnafan rojekê

dikanên xwe girtin. Di navbera xelkê û leşkeran de şer derket û nêzî 100 kesî hatin girtin.

Ji protestokirina bûyaran Nisêbînê û Cizîrê li Diyarbekirê jî di 27'ê Adarê de 5 hezar xwendevanên Unîversîta Dîclê qerar stendin ku 3 rojan nekevin dersan û di 29'ê Adarê de "**Platforma Demokratîk**" (ku ji alî hêzên TEVGER'ê û hin kesên welatparêz ve hatiye avakirin) bi belavokê bang esnafa û zenetkarên Diyarbekirê kirin ji bo ku di roja 30'ê Adarê de rojekê dikanên xwe bigrin. Li gel hemû tedbirên dewletê hemû esnafên Diyarbekirê ev daxwaz anîn çîh û roja din dikanên xwe girtin. Li ser van bûyaran 12 kes hatin girtin.

## Tevger fireh dibe

Li Sêrtê, Meletyayê, Adanê, Anqerê, Stenbolê û gelek bajarên din û li dervayî welat bi tevgerên cur be cur ev terora dewleta Tirk ku li Kurdistanê dimeşîne bi tundî hat protesto kirin.

Bûyerên li Kurdistanê bûn ji alî hin parlamenterên Kurd ve li Meclîsê jî hat zimên. Parlamentarê Diyarbekirê Salih Sumer ev pirs ji Serokwezîre Tirkîyê Yildirim Akbulut kir: "Tiştên ku li Cizîrê dibin bê kêr û zêdeyî wek tiştên ku leşkerên îşxalkarên Îsraîl ku li Filistînê dikin e. Li her cihê Tirkîyê meş û mitîng çê dibin, lê gelo çima leşker kesî nakujin, li Cizîrê xelkê gulebaran dike?"

Li ser van bûyaran dawî li herêmên Mêrdînê tedbirên mezin hatin stendin. Gava rojnama me ket çapê, li ser siyaseta rojên pêş ku wê li Kurdistanê bê meşandin, di bin seroktiya Serokkomarê Tirkîyê Turgut Ozal de civînek bilind bi hukûmet û partiyên muxalefê re bihata çêkirin. □

## Hindik-Rindik

### Hîn şîrîn nebûye

Her du bi hev re di baxçê timarxanê de digeriyan. Yek, çû li ber hewz sekîni, qurûti avê bû gulmek av kir devê xwe, bîstekê di devê xwe de çelqand û dûre tuyî erdê kir. Hevalê wî jê pirsî:

- Çer bû, te çima tû kir?

- Min vê sibê du dendî şekir avêtibûyê, lê, hîn şîrîn nebûye.

Hevalê wî got:

- Qey ewê ne şîrîn be, ma te hat li hev xist?

### Nezaniya hesêb

Yekî jî terîqeta Bektaşî di rojêke remezanê de dema vedixwar hat girtin. Mêrikê Bektaşî derxistin hember axayê yenîçerîyan (Yeniçerî; heta sala 1826'a li Stenbolê eskerên bi pera bûn).

Axê yenîçerîyan, li mêrik rabû, got, "Ya kafir tu bi vî salê xwe şerm nakî, ji Xwedê natirsî, vê rociya remezan tu radibî araqiyê vedixwî!"

Piştî azarek baş, got, "bibin penceşed çoyî li vî kafirî xîn."

Gava got bibin penceşed çoyî lê xîn, mêrikê Bektaşî şaş mam, çavên wî çûn orta qatê wî, got:

- Axayê delal, li min bibore: Lê te di jiyana xwe de qet çu nexwariye, ya jî tu bi jimarê nizanî, ez benî!

### Du'a çewt fahm bû

Yekî gundî mangak û kereke wî ya piştikurmî hebû. Zivistan bû, destê wî pîrr teng bû. Şevêkê destê xwe li ber Xwedê vekir, got:

- Ya Rebî, tu min jê vê kera piştikurmî xelas bikî, êdî hew qeweta min digihê ez em bidim vê kera piştikurmî.

Sibê, gava deriyê êxur vekir, bavo çî bibîne? Mange miriye û kera piştikurmî sax e! Bi wê hêrsê jî êxur derket der, li ber derî kir hewar û ban cîran û gundiyan kir. Gundî hatin li serî kom bûn. Berata li erdê nişanî wan da û got:

- Ev çî ye?

Milet got: "Ev mange ye..."

- Lê ev tebayê piştikurmîyê guhdîrê çî ye?

Milet got: "Ew jî ker e..."

Li ser vê bi hêrs got:

- Ya mubarek! Ez bi qurbana e'daleta te bûmo, tu bi qasî van şiven û gavanan jî nebû, me jî te recak kir, te ker û mange jî hev negerand... □

## Beşikçi dîsa hat girtin



Alimê Tirk ê hêja, dostê gelê Kurd ê bi nav û deng Sosyolog Dr. İsmail Beşikçi di 11'ê Adarê de ji alî Mahkema Ewlekariya Dewletê (DGM) a Stenbolê ve bû ku mahkeme bibe hat girtin û ew avêtin hefsa Sagmacîlarê. Sebê hêfskirina Beşikçi pirtûka wî ya ku çendekî berê bi navê "Devletlerarası Sömürge Kürdistan" (Kurdistan; Koloniya Nav Dewletan) e. Beşikçi di pirtûka xwe de bêtirs, bi zimanekî vekirî û îlmî rewşa Kurd û Kurdistanê analîz dike û li ser pirsê aktuelê Kurdan dîskîne.

Li ser hefiskirina Beşikçi gelê Kurd nerazîbûna xwe nîşan da,

gelek kesên pêşverû, nivîskar û awûkat girtina Beşikçi protesto kirin. Li alî din mebusê Diyarbekrê Salih Sumer di 20'ê Adarê de girtina İsmail Beşikçi bir Meclîsê û ji Serokwezîre Tirkîyê Yildirim Akbulut pirs kir: "Hûn mumkûn dibînin ku di welatekî de alim ji ber fikrên xwe yê ilmî bîn girtin û ew welat karibe tekeve Pazara Ewropa ye."

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê jî bi tundî girtina Beşikçi bi belavokê protesto kir û ji hukûmet û serokkomar T. Ozal serbestiya wî xwest. Federasyonê, bi vê armancê ji Serokkomarê Tirkîyê T.Ozal re bi sedan rismên Beşikçi, ku li pişt risim daxwaza berdana wî tê kirin, şand.

Dr. Beşikçi jî bo pirtûk û xebatên xwe yê li ser Kurdan bi teyayî 10 sal û 10 mehan di hefsê de ma. Wî, di hefsê de li ber xwe da, serê xwe ji dijmin re xwar nekir. Ew, berî sal û nêvekê jî hefsê derketibû. İro jî dîsa ew ji bo vê pirtûka xwe, bi Xala Qanûna Cezaya Tirkîyê a 142/3-4 tê îthamkirin û heta 15 salan ceza jê re tê xwestin.

Bi mîrxasî û alimiya xwe Beşikçi, ne tenê ji rewşên birên Tirkîyan re û her wisa ji wan ronakbîrên Kurd ên ku eslê xwe înkardikin re jî nimûneyek e.

## Destpêk r. 7

here. *Wilo jî pêwendiyên mîletên cîran û destaleta resmî, li hember wan tene guhertin. Niha çî bi Kurdan re çê dibe? Gelo ew hîn wek berê "gerok in?"*

**Bersiv:** Girava çanda Kurdî li Sovyetê, Ermeniya bû. Li vir jî bo 60 hezar Kurd, ne tenê rojnama "Riya Taze" tê weşandin, her wiha jî gelek berhem 'pirtûkên xwendinê belav dibin. Bi rengê periyodîk radyoya Kurdî li Erîvanê kar dike. Li nik Yekîtiya Nivîskarên Ermenîstanê, sekreterê nivîskarên Kurd jî heye. Û li înstîtûta Rojhilatnasyê beşê Kurdî jî ciyê xwe girtiye. Lê.. pêlên ku ji ber bûyerên Nagorna-Qarabax rabûn, gihîştin vê girava Kurdî jî. Û careke din bi hezaran Kurd jî ciyên xwe rabûn. Dîsa, mişekoçî, bêyî çî û warîti bûye nesîbe me. Careke din çûyîna li ber bê ye"

**Pirs:** *Nayê bîra min ku pressê qala civîna Kurdan kir. Lê li gel wiha jî, meşek wiha li Moskova çê bûbû. Gelo daxwaza çî dihat kirin?*

**Bersiv:** Piştî meşê, di meha İlonê de Kongra tesîsî ya Kurdan

## "Li ber bê çûne"...

a Yekemîn li Sovyetê li dar ket. Daxwazên wan konkîret û adil bûn. Vegera itîbara ku di heyamê terora Stalinê de, bi nav bûbû. Avakirina otonomiya Kurdistanê Sovyet û vejîna kultur û zimanê Kurdî.

Vî mîletê ku lawên wî berhemên giranbûha didan cîhanê, roja îro kultura wî wînda dibe û ber bi mirinê ve diçe. Û ew bi xwe jî bi darê zorê asimîle dibe. Ji bo parastina xwe, wek mîletên din ên piçûk, divê Kurd xwe bikin yek û niha ew vî tiştî dikin.

**Pirs:** *We got; "wek mîletên din ên piçûk". Bi vî tiştî hûn xetereke giştî didin problemê. Û "mîletên mezin" emê bêjin Rûsî, ma ew bi riyên din pêşde diçin? Ma ew jî, bi taybetî niha, ne muhtacê demokrasiya jiyane û fi-rehbûna parastina civakê ne?*

**Bersiv:** Ez naxwazim dijitiyê tîxim navbera elementên curbucur ên yekîtiyek kamil. Em hemû bi awakî ne bi me ve girêdayî, ku li gora zagona insanîtiyê ya giştî, bi pêşve diçin. Lê belê di wextek dirêj de ev zagon, ji alî siyaseta dewletê ya resmî ve, di ber

çavan re derbas nedibû. Em îro vî berê (hasilat) tehl diçin. Ez di wê baweriyê de me, ku em hemû dûrî xweşiyek dirust in. Lê mîletên piçûk, ji ber ne parastina civakî, ji hemûyan bêtir tade gişt wan.

**Pirs:** *Tê bîra we, me hev-peyvîna xwe, ji çî dest pê kiribû? Me ji nezaniya di pirsê milî de, dest pê kir. Ma çî manî heye ku ji bo xebata li dijî vê "trajediya ku ji şerê nezaniyê çêdibe", em sil-salekê li ser van mîletên piçûk derxînin? Ez di wê baweriyê de me ku xwendevan dê girîngiyek taybetî bide vî tiştî. Û wê gelek keşfên bêhincikandî li ber me vebînin?*

**Bersiv:** Ez dibêjim hûn ciwan in, dem dema we ye û rê li ber we vekirî ye. Ji alî xwe de, ez dikarim, di vê pirsê xêrê de, alîkar bim. De were em di vî warî de li xwediyê yek nêrinê bigerin. Kultura çî mîletê heye, tecruba nişfan a ku gihaye ser hev. Pê-wîst e, qedrê wê bête dayîn, li ser bête rawestîn û lêkolîn çê bibin. □



## Deyîrê Ma

## Arêkerdax: Malmîsanij

## HUSÊ HACÎ

Leyro, leyro, leyro, leyro, leyro, leyro, leyro, leyro,  
leyro, leyro leyro!

Lo, leyro leyro, leyro leyro!

Leyro, leyro, leyro, leyro, leyro leyro, leyro leyro!

Gidî, wilay may tu kor bo, Huseynê mi!

Leyro, leyro, leyro leyro, leyro leyro!

Leyro, leyro leyro, qîtekê (2) mi!

Leyro Husê m', -wilay mi va- Mistî Bezi esker ra resaynî,  
Ax leyro, -wilay mi va- şarî naşt û başt a ti ra vaynî (3),  
Leyro, wilay Husê Hacî, Leyla (4) lo dim a niyaynî.  
Leyro, leyro, leyro, leyro, leyro, leyro, leyro leyro, leyro leyro!  
Leyro, leyro, leyro leyro, lûlbendê (5) mi!

Leyro, daykê -wilay mi va- Husê m' qatira qirri (6)  
berda serê eynîyo.

Ax leyro, -wilay mi va- kerd vernîya (7) Hustê mi  
Leylay Terhincono (8),

Leyro, va- "tu ra vonî Husê Hacî'yo,

Huso, wilay ez ma'tacî (9) sifrê a dinî yo.

Leyro, wilay Huso, ez aşiqê beşna tu (10) yo."

Leyro, wilay Husê m' va "Siktir, dela orispî yo!"

Leyro, wilay, "mi xu rî to di kerdî yariyo (11)."

Leyro, leyro, leyro, leyro, leyro leyro, Huseynê mi, ax!

Leyro, -wilay mi va- nomey daykday Hustê mi Emîna ya.

Leyro, -wilay mi va- nomey keynay Hustê mi Letîfa (12) ya.

Leyro, -wilay mi va- nomey ciniyay lacê mi Zilêxa ya.

Leyro, -wilay mi va- nomey dostay Husê mi Leyla ya,

Leyro, -wilay mi va- ya (13) serey lacê mi dim a ya.

Leyro, leyro, leyro leyro, Huseynê mi, ax!

1 Na deyîri heway vatişê Wisî Cimî (Yusuf Gezer) amey nuştîş. Wisî  
Cimî, hetê Palî ra, Qerebegon (Qerebegan) ra wo.

2 qîtek : qîtalek, Tçalek, wirdêk, wirdêlek, wirdêkek, widêlek, wilek,  
werdî, qic, qicêk, qij, qjêk, şenik; wiçalek, miçalek

3 vaynî : vatinî, vatinê, vatnî, vatnê, vatê

4 Leyla : Cenîya Mistê Bezi bî. A wû Husê hajî zeri devistibî pê.

5 lûlbend : lûlbend, lûlîcenayox, keso ki zeli (lûlî) ceneno

6 qirri : qiji

7 vernî kerdîş : nişk a vernî di vejîyayîş, lezkanî şîyayîş vernî

8 Terhî: Vatişan gore Weşîney di yew mezra ya, Qezay Palî ser o  
ya.

9 ma'tac : muhtac, ma'taj, motaz

10 tu : to

11 yari : heneki, kuşat, kuşad

12 Letîfa: Keyna Husê Hajî ya, ti ra Lutfiya zî vanê.

13 ya : a, aya

## MÎNA (1)

Day, day, dayê; day, Mînayê! (2)

Day, day, dayê; day, Mînayê!

Hajî(3), Mîna şîya ça wo?

Hajî, Mîna şîya ça wo?

Mînay Hajî biya vinî.

Mînay Hajî biya vinî.

Kuça comî (4) ma ra şîya.

Kuça comî ma ra şîya.

Komî diya, komî nêdiya?

Komî diya, komî nêdiya?

Lajê Mihê Şahîni (5) xwi rî diya.

Lajê Mihê Şahîni xwi rî diya.

Mihê Şahîni tewrey (6) gozon o.

Mihê Şahîni tewrey gozon o.

.....(7)

1 Na deyîri yew deyîra dewa Dêsmunî ya. Mî a heway vatişê  
yew Pirejmanijî nuştî.

2 Mîna : Keyna Haj 'Arifî ya û dewa Dêsmunî ra ya. Maya  
Mîna Pirejmanij a (Dêsmunî yew dewa qezayê Palî,  
Pirejman zî yew dewa qezayê Piranî ya).

3 Hajî : Namey yê bi xo 'Arif o (Haj 'Arif), Dêsmunîyij o û pi  
Mîna wo.

4 comî : camî, cûmî

5 Mihê Şahîni : Yew Pirejmanij o. Be'dî key xwi berd Gihari  
û weyra mend (Gihari yew dewa qezayê Palî ya).

6 tewrey : towre, tore, torbe, tûrbe, pêlek

7 Na deyîri nêmcet a.

## FATIMA (1)

Day leyro, leyro, leyro; dayê leyro, leyro, leyro.  
Day leyro, leyro, leyro; dayê leyro, Fatimay mi.

Yere wo, rojawan o, dayê leyro, Fatimay mi.

Yere wo, rojawan o, dayê leyro, Fatimay mi.

Ez şîya Çirray Birano, dayê leyro, Fatimay mi.

Ez şîya Çirray Birano, dayê leyro, Fatimay mi.

Cêro yeno qifley (2) aşikano, dayê leyro, leyro, leyro.

Cêro yeno qifley aşikano, dayê leyro, Fatimay mi.

Verên Husê Aşikan o, dayê leyro, leyro, leyro.

Verên Husê Aşikan o, dayê leyro, Fatimay mi.

Çanqil neqra (3) ro dano, dayê leyro, leyro, leyro.

Çanqil neqra ro dano, dayê leyro, Fatimay mi.

Rayêrî (4) Sermikîs'î (5) rez î, dayê leyro, leyro, leyro.

Bêwey Sermikîs'î rez î, dayê leyro, Fatimay mi.

Dindanê Husê mi di rêz î, dayê leyro, leyro, leyro.

Dindanê Husê mi di rêz î, dayê leyro, Fatimay mi.

Mî rî vanî Fatay Nebîyano, dayê leyro, leyro, leyro.

Mî rî vanî Fatay Nebîyano, dayê leyro, Fatimay mi.

Waştay Husê Aşikan o, dayê leyro, leyro, leyro.

Waştay Husê Aşikan o, dayê leyro, Fatimay mi.

Hus axay sendaliyano, dayê leyro, leyro, leyro.

Hus axay sendaliyano, dayê leyro, Fatimay mi.

Taxmîş keno gozligano (6), dayê leyro, leyro, leyro.

Taxmîş keno gozligano, dayê leyro, Fatimay mi.

Çifte por qayme (7) dano, dayê leyro, leyro, leyro.

Çifte por qayme dano, dayê leyro, Fatimay mi.

Rûşeno (8) serê sendaliyano, dayê leyro, leyro, leyro.

Rûşeno serê sendaliyano, dayê leyro, Fatimay mi.

Nuseno (9) mektubano, dayê leyro, leyro, leyro.

Nuseno mektubano, dayê leyro, Fatimay mi.

1 Na deyîri heway vatişê yew dengbêjê Dêreyîjî nu-  
siyaya (Dêreyî yew dewa qezayê Piranî ya).

2 qifley: qufle, cergi, ref

3 neqra : neqera, neqere, dawuli, dawili, def

4 rayêr : ra, ray raye, rayi, rae, rayer, rayir, rayir, rahar,  
raar, rar, rer, rey, reye, rê, rî

5 Sermikîs (Sermkîs) : Yew dewa qezay Palî ya, Dew-  
leta Tirkiye namey na dewi bedilnawo, kerdo Gümüşyaka.

6 taqmîş keno gozligano : gozligano dano xwi çiman ro,  
gozligano xwi çiman a keno, gozligano xwi çiman a nano

taqmîş : Tirkî di "takmîş"

gozlig (guzlig) : Tirkî di "gözlük"

7 qayme : qeyme

8 rûniştîş : ronîştîş, ronîstene (nistene ro), ruenîştîş, ru-  
wenîştîş (niştîş rûe); niştîş, nîstene, nîstene

9 nuştîş : niştîş, yazi kerdîş

## NEWROZ PÎROZ BO

Roja vîst û Jewina Adari Newroz o.  
Newroz roşanê Kurdan o. Adirê New-  
rozî zey sembolê azadî yeno qebûl-  
kerdîş.

Vanê zaf verî, merdimêndo zalim  
estbiyo. Nameyê nê merdimî Dehak  
biyo. Dehakî zaf ta'da û pîsey bi Kur-  
dan kerda, heta qeçê eynan zî sere ci  
kerdê... Kurdan diyo ki Dehakî rê se-  
reronayîş û bêvengmendîş çare niyo,  
bi serekeya Kawayê Asingerî (Ka-  
wayê Kureçî), ver a Dehakî sere hewa  
dawo.

Rojê Kurdî hêriş kenê dizida De-  
hakî ser, text û tacê ci vila kenê û ci  
ra reyênê. Dim a cinî, camêrdî û qeç  
û qûl herme şinê keyandê xo, çinayê  
xo yê newî û weşî danê xo ra, vijênê  
kuçan, kewnê pê dest, kay û dêrî ke-  
nê. Koyan ser o adir wekenê. Bi roş-  
naya kilda adirî ya, mizgînîya De-  
hakî ra reyayîşî resnenê dew û sû-  
kandê çorşmedê xo. A roji ra heta  
ewro adirê şewda Newrozî zey nişanê  
azadî yeno qebûlkerdîş.

Bê Kurdan, Farisî, Belûcî û Afganî  
zî Newrozî pîroz kenê.

Ewro Kurdistan di pîrozkerdîşê  
Newrozî yasax o. Labirê fina zî diş-  
menê ma nêşenê vernî pîrozkerdîşê  
Newrozî ra bigîrê. Emser zî heme  
cayandê Kurdistanî di adirê Newrozî  
kewt a ci. Bi hezaran a Kurdî kewtî  
kuçan û Newroz pîroz kerd. Qandê  
pîrozkerdenda Newrozî teberdê we-  
latî di zî xeylê karê erciyayey bî.

Newrozê şîma wendoxan zî pîroz  
bo.

## NEWROZ

Newroz namê roşanî  
Rojayê kay û dilanî  
Qandê azadîya xo  
Ma bipernê bewranî

Ma torinê Kawa yê  
Zey aw û adira yê  
Wa Dehakî bitersê  
Ma nêkewtê payra yê

H. Diljen

## Programê Radyodê Komela Kurdistanî ya Uppsala

Way û birayê erciyayey û delalî,

Her hefte roja dişeme se'at 18.00 ra heta 18.30 programê radyodê Komela Kurdistanî ya Uppsala esto.

Programê ma, Uppsala Nâr Radio 98,9 ser o vijyêno û dom keno.

Program no babet a dest pey keno û rameno:

a)Beşê qeçkan: No beş di qandê qeçkan fiqrey, estanikî, şî'rî, dêrî û kay qeçkan yenê wendeni.

b)Beşê zîwanî: No beş di gramerê Kurdî ser o vinderêno û nînan ser o me'lumat yeno dayeni.

c)Namdarane xo bişinasni: No program di qalê şairanê Kurdan ê verênan beno.

Qandê ki ma ê şairanê xo yê erci-yayan xo vîr a nêkerê û her wext bi-yarê xo vîrî, heyatê înan û şî'rê  
înan dênê şînasnayeni û yenê wendeni.

d)Beşê ciwanan: No beş di jî ciwanan (xortan) ra jew yeno, halê ciwanan û tarîx û cografyada Kurdistanî  
ser o me'lumat dano. Kurdistanî bi ma dano şînasnayeni.

e)Şî'r û muzîk: No beş di şî'rî yenê wendeni û muzîkê Kurdan ra numû-ney yenê cinayeni.

Mîyabeyndê her beşî di jî muzîkê Kurdan cineyêno. Eger estbê agahdarî û xeberî yenê wendeni, mîleti  
dêna peyhesnayîş.

Virastenda programan di ma mutexassis nîyê. Qandê coy jî ma zanê ki xetay û kemaneyê ma bolî yê.  
Labrê rewrewî ma bi xo nêşenê kemaneyanê xo bivînê û ferq bikerê. Enbazê ki goştarey kenê, şenê diha  
rihat kemaneyanê ma bivînê. Qandê ney lazim o enbazî ma rê ardim bikerê. Eger enbazî kemaneyanê ma  
binusê û birîşê (ray kerê) adresa cêrêni yan zî telefon bikerê, ma do bol û bol memnûnî bê.

Adres: Komela Kurdistanî ya Uppsala, Box: 25028, 750 28 Uppsala

Telefon: 018-12 85 59

Koyo BERZ



Tosinê Reşîd:

# Kurd jî mafên xwe dixwazin

Roja 31'ê Adarê li Stockholmê Tosinê Reşîd li ser "perestroyka û rewşa Kurdên Sovyetê" civînek informasyonê çêkir. Wî di axaftina xwe de bi kurtayî qala rewşa siyasî ya Kurdên li neh cumhûriyetên Sovyetê belavbûyî kir û got ku Kurdên ji van neh cumhûriyetên Sovyetê sala çûyîn, di meha Gulanê de li Moskoyê mitîngek çêkirin.

Piştî mitîngê Kurdan daxwazên yê demokratîk û milî pêşkêşî Gorbaçov kirin. Wan daxwaz kir ku hukûmeta Sovyet ew otonomiya ku di dema Stalîn de ji wan hate stendin, cardin paş de bide wan.

Li gor gotinên Tosinê Reşîd, di vî warî de hîn tu gavên konkret nehatine avêtin. Problema herî mezin ew e ku, ew derên ku Kurd

dixwazin, cumhûriyet qebûl nakin û ciyê ku cumhûriyet qebûl dikin, ji ber ku ne ciyên jiyane ne, îcar jî Kurd qebûl nakin.

Li alî din T. Reşîd diyar kir ku Kurdên ji neh cumhûriyetan komelek bi navê Yekbûnê ava kirine, ku wê komele ji bo sitendina otonomiyê xebatê bike.

Civîn ji alî Federasyonê ve hatibû amadekirin.

## Dûmahîkên nivîsan

### Qetlîama Helepçê bi tundî...

1000 xwendevanî qetlîama Helepçê protesto kirin. Li ser mane û girîngiya roja 16'ê Adarê bi Kurdî û Tirkî axaftin hatin kirin. Xwendevanan bi şîarên wek "Bimre mêtîngehkarî!", "Kurdara Azadî!", "Kurdistan wê ji faşizmê re bibe gorr!" kîna xwe ya li dijî dîktatoriya BAAS'ê dan diyarkirin. Piştî axaftinan, xwendevanan, xwestin ku bimeşin nav bajêr, lê polîs êrîşî xwendevanan kir. Li ser êrîşa polîsan xwendevanan bi kevîran xwe parastin. Li dor 100 xwendevanî hatin girtin.

Li Konyayê jî xwendevanên Kurd xwestin ku qetlîama Helepçê protesto bikin, lê polîs êrîşî wan kir, li dora 50 xwendevanî girtin.

Li Unîversîta Çukurovayê, ku li Edenê ye, xwendevanên Kurd li vir jî ji bo protestoya qetlîama Helepçê

civîyan. Polîs êrîşî xwendevanan kir. di netîca êrîşa polîsan de gelek xwendevan birîndar bûn û hatin girtin.

Roja 15 û 16'ê Adarê li Stenbolê li ser qetlîama Helepçê gelek protesto û xwepeşandan hatin çêkirin. Roja 15'ê Adarê li Unîversîteta Stenbolê 600 xwendevanên Kurd bi navê "Xortên Musilman" qetlîama Seddam a Helepçê protesto kirin û şîarên wek "Xwîn, zem zulm, ha ji we re Kurdistan!", "Li Helepçê qetlîam, qatîl Saddam" avêtin. Di roja 16'ê Adarê de jî li Unîversîta Stenbolê, li ber derê Fakulta Hiqûqê nêzî 500 xwendevanî civîyan, forumek amade kirin. Xwendevan li gel berxwedana Nuseybînê, qetlîama 16'ê Adarê ku 7 xwendevanên Tirk û Kurd ji aliyê faşîstan ve hatibûn kuştin û qetlîama Helepçê jî bi bir

anîn. Xwendevan, piştî axaftinan meşîyan û qatîlên Bexdadê protesto kirin.

Li Anqerê, li Erzuromê, li Wanê û li gelek ciyên din jî qetlîama Helepçê hat protestokirin.

Li derveyî welat jî qetlîama Helepçê hat protestokirin. Li Swêdê li gelek bajarên komelên ku girêdayî Federasyona Komelên Kurdistan li Swêdê û Komîta piştigiriya gelê Kurd bi hev re qetlîama Helepçê protesto kirin. Li Stockholmê TEVGER, Cepha Kurdistanê Iraq û Federasyonê bi civînekê û mitîngeke girseyî qetlîama du sal berê protesto kir. Li Bulgarîstanê, li Almaniyayê, li Fransayê û çî bigre li hemû welatên Ewropa qetlîama Helepçê hat protestokirin, şehîdên wan hatin bi bîranîn.

### Nameyek pîrozbahî

#### Newroz, eyda we pîroz!


Îro 21'ê Adarê ye. Her Kurdek bêsebir li benda vê rojê ye. Cejna Newrozê, Cejna sala taze, cejna baharê ye. Dengê def û zîrnê xweş tê. Li her cî agir pê dixin. Qîz û xort, jin û mêr kincên netewî li xwe kirine, li dora agir govandeke giran digrin, bi eşq û şa distîrên û direqîsin. Bayê nerm û hinêk tê. Maqamê zîrnê tevî xwe dibe nava çîyan, berriyan û zozanan belav dike.

Newroz, Newroz!

Eyda we mibarek, pîroz!

Delala Memê Recevî/ Erîvan

## Xaçepîrs



**Çeperast:** 1-a)Di xortaniya xwe de li bajarê Farqînê li dijî zilma esker û memûrên bertûlxwer ji bo gundiyan dibe cihê gilî û gazindan, paşê dibe endamê Partiya Karkerên Tirkîyê (Türkiye İşçi Partisi) li bajarên Kurdistana Tirkîyê beşdarî mitîngan dibe. Di salên 1970'yan de dibe serokê belediya Diyarbekirê. Di sala 1980'yan de tê girtin. Li girtîxana Diyarbekirê bi berxwedana xwe dibe nimûneyê têkoşînê, b)Kûçîk (berevajî). 2-a)Ne-nexêr (berevajî), b)Halê ne şer, aramî, tenayî, c)Pronavekî îşarkî. 3-a)Paşa, yan qiralên kevin ên Kurd, b)Ne kevin (berevajî), c)Teyrekî mezin û kûvî. 4-a)Dewarek (berevajî), b)Lîstîkek e, du kes dilîzin her yek ji wana 16 berik û 64 malik hene. 5-a)Ne mirî, bi ruh, b)Erd yan zêviyê ji zû de nehatî

kêlan. 6-a)Perçê pir biçûk (berevajî), b)Daçkek (berevajî), c)Ne xweşiyek. 7-a)Nebatek, garisê spî. b)Pronavekî kesîn. 8-a)Ne germ, b)Kesê ku alîkarî dike. 9-a)Bac, xwêk, wêrgî, b)Bajarekî Kurdistana Tirkîyê. 10-a)Hejmarek (berevajî), b)Xwarineke Kurdan, c)Di zîmanê Kurdî de veqetandekê ji bo kes û tiştên nêr. 11-a)Rengêk, b)Kesên ku tiştên xwe yê firotinê li ser piştê dewaran gund bi gund di-

gerîne û difroşe, c)Gelek. 12-a)Fêkiyek e ku li welatên pir germ dara wî şîn dibe(berevajî), b)Nezle, persîv (berevajî).

**Serejêr:** 1-a)Me'elim, kesê ku xelkê fêrî tiştina dike, b)Pozbilind. 2-a)Navê cihekî ji laşê mirov, b)Sebeb, eger. 3-a)Jina li berdestê jinên axa û şexan, jina xulam, b)Du herfên bêdeng. 4-a)Paşdaçkek, b)Mûyê dewaran, por. 5-a)Weşîya tîrî, gûşî. b)Diya jina mirov, yan diya mêrê mirov. 6-a)Dilketiya Memo, b)Ji giya û kulîlkên cihê çêdikin, davêjin nav xwarinê ku tama wê xweş bike. 7-a)Nexweşiyek (berevajî), b) Nîşan, îşaret, îspat, c)Mêrê diya mirov (berevajî). 8-a)Di salên 1970'yan de kaleciyekî navdar ê taximê Fotbola Sovyet (berevajî), b)Aştî, tenayî, ewlehî (berevajî). 9-a)Kes yan rêxistina ku tiştêkî amade dike. 10-a)Mirovê dîn, dînê xeter, b)Zîman, lîsan, c)Navê cihekî ji laşê mirov. 11-a)Aşq, b)Kesê ranekêfî. 12-a)Welatek li Efrîqayê. b)Heywanekî pir bi hêz.

### Bersîva hejmara 101'î

**Çeperast:** 1-a)Rêncber, b)ga. 2-a)Eten, b)Tûtme. 3-a)Vûv, b)Bablîsok. 4-a)Xîne, b)Ap, c)Lo. 5-a)Sil, b)Rê, c)Al. 6-a)Kofî, b)Kêr. 7-a)Rî. 8-a)Soz, b)Dûndeh. 9-a)Erêkirin, b)Aş. 10-a)Meh, b)Kurnî. 11-a)Kade, b)Ka, c)Ra. 12-a)War, b)Pê, c)Mê.

**Serejêr:** 1-a)Revend, b)Senew. 2-a)Êtûn, b)Bor, c)Da. 3-a)Nevisî, b)Zêmar. 4-a)Cn. b)Xîfş. c)Kek. 5-a)Lo, b)Dih. 6-a)Etap, b)Rû, c)Sê. 7-a)Rûbar, b)Kinê. 8-a)Tl, b)Kê, c)Kurd. 9-a)Amîn, b)Erê, c)Mar. 10-a)Se, b)Rihan. 11-a)Alo, b)Şîr. 12-a)Alkolîst, b)Ta.

### Li ser pirsên sosyalîzmê...

tê bigihê û jê netîcan derxe. Ji bo wê jî hîn rehetir meriv kare rewşa Honeker û dijitiya wî li hember Gorbaçov û perestroyka û glasnostê û sedemên wê fahm bike. Dema ku glasnost û perestroykayê li Sovyetê dest pê kir li gor vê politikayê Sovyetê welatên sosyalîst bi serên xwe hiştin. Partiyên van welatan, serok û kadroyên van partiyan gelekî baş zanibûn ku, ev xet di dawiyê de wê ev xet zirarê bide wan û loma jî politîka Gorbaçov qebûl nekirin. Ji ber ku gel ne bi wan re bû, hêzên van temsîla hemû gel nedikir. Sistemê bîngêhê bû, qeweta xwe jî Sovyet û Ordiya Sor digirt. Di dawiyê de Sovyetê nî-şan da ku, êdî wê ji nuha û şûn de têkilî karê hundirê welatên sosyalîst û politîka van nebe.

Divê ku, her partî bi hêz û qeweta xwe û bi dînamîzma xwe sosyalîzmê li gor şertên welatên xwe ava bike. Sistema sosyalîst di behra kapîtalîzmê de bû girav "sosyalîst" û li hember ekonomî û teknolojiya behra kapîtalîzmê û li hember gelên wê, xwe ranegirt, îktûdarên wan yek bi yek ketin û hîn ev proses dom dike. Ev welatên sosyalîst wek qesrên jî qartona çêkirî hilweşîyan. Me carekê didit ku, dema gel ne bi merivan re be, bi ordiyê, bi leşker û polîs ve îdarekirina welatêkî hewqasî ne hêsa ye.

Li ser navê sosyalîzmê xanedanî li hin welatan hatibû awakirin. Aqîbeta serokên van welatên sosyalîst, bi aqîbeta serokên kîjan we-

latan dimîne. Divê meriv li ser van bûyaran gelek dût û dirêj bifikire. Helbet ez na-xwazim hemû kêmasî û şaşîyan têxim hustiyê çend heb serokan. Wexta baş an xerab biçê, para pêşî serok distîne, ev qaîde ye. Lê divê sosyalîzma ku van welatan ava kiribû wek model bê munaqêşe kirin. Kadro û serokên ku hemû jiyana xwe dabê têkoşîna sosyalîzmê çawa dikeve rewşek hewqas xerab. Kêmasî û xeterî di qereqtera merivan de heye, ya jî di modêla ku hatibû damezirandin de kêmasî heye. Ez bawer dikim ku, kêmasî û çewtî di hemû mirovan de heye. Lê her sistem li gor xwe tedbîran distîne ku, ev çewtî û kêmasî zerrê zêde negihîne sistemê.

Divê marksîstên Kurd li ser van probleman gelekî bisekinin, munaqêşeyên teorîk û kûr çêkin. Hela dema ku sosyalîstên Kurd, yekîtiya sosyalîstên Kurd di nav partiyekê de munaqêşe dikin, munaqêşekirina vê yekê hîn muhîmtir e. Divê li ser modela sosyalîzmê hîn zêdetir bisekinin, munaqêşeyên teorîk ên eşkere bikin. Ev proje û modêl wê di munaqêşe û lêkolînên ilmi de pêk bîn.

Ji aliyê teorî ve sosyalîzm û demokrasiya sosyalîst bi her hawayî, ji demokrasiya burjuwazî pêşdetir e. Lê çawa pêşdetir e? Ne tenê bi gotinan. Bi program û proje ve. Sosyalîzma ku em dixwazin, ji bo wê têkoşînê didin, divê hewl û îmkanan pêk bîne ku, hemû civat xwe di nav avaki-

rîna sosyalîzmê de bibîne. Demokrasiyekê pêk bîne ku, hemû civak jê para xwe bistîne. Divê her meriv û grup xwediyê mafên demokratîk be ku, gava dilê wî xwest, li ser rewşa civaka xwe ya aborî, sosyal û politîk munaqêşeyekê bê tîrs bike. Dîtî û daxwazên xwe bi azadî çap û propaganda bike.

Divê her grûp an çîn xwediyê mafên rêxistin damezirandinê be. Partiya sosyalîst, ku xwediyên bîr û bawerî yê cihê cihê ne, bi kadroyên xwe, bi daxwaz û programa xwe hebin.

Sosyalîst jî divê bi qasî burjû-wazî "demokrat" bin. Hewl û îmkanan bidin ên ku ne sosyalîst in jî, di çerçewa demokrasiya sosyalîst de bi rêxistin û hêz bin.

Çawa ku em ji bo partiyên çep û komunîst heqên rêxistinî jî dûzeta kapîtalîstan dixwazin, divê ew heq jî bo kesên ne komunîst jî di civaka sosyalîst de were dayin. Çawa ku burjuwazî ji bo civata kapîtalîst tedbîr stendiye, divê komunîst jî wek burjuwazî, ji bo civata sosyalîst biparêze tedbîran bistîne. Divê em îmkanan pêk bînin ku civakek bi her awayî plûralîst ava be. Divê her grûp an partî biqasî quweta xwe, li ser civaka xwe, xwedî heq û gotin be. Riya wê jî parlamento ye. Bi bîr û bawerîya min, civakek bi tolerans û plûralîst ancax wê karibe bi riya demokratîk, parlamentê û sosyalîst bê awakirin.



# Pûşkîn û Kurd

## Siyamendê Sêrtî

Şairê Rûs yê mezin A. Pûşkîn hîn ji zaroktiya xwe ji gerr û sey-rana li nav welat û herêman pîrr hez dikir. Bi vî rengî naskirina wî bi adet û kultura gelên din re fi-rehtir û pirtir dibû. Sala 1892'an ew diçe eniya şerê di nav ordiya Rûs û Osmaniyên de. Pûşkîn bi leşkerên Rûsî re dighê Qersê. Berî ku ew herin Erziromê, ew dizane ku di nav kesên deverê de, netewakî bi navê Kurd heye. Ji wan beşek heye ku Şeytên dihebînin. Bi vî yekê ew matmayî dimîne û daxwaza ku van kesan ji nêzikayî ve nas bike, li cem çêdibe.

Di vî warî de Pûşkîn bi xwe di pirtûka xwe de ya bi navê "Çûyî-nek heya Erziromê", dinivîse ku ew bi Yezîdîyan re rûniştîye. Û ji serokekî wan pirsîye:

-Gelo rast e hûn şeytên dihe-

bînin?

-Na, ne rast e. Ev peyvên vala ne bi pey me dixin. Çilo bawerîya we bi xwedayekî heye, wilo ji bawerîya me pê heye. Lêbelê em laneta li şeytên durust nabînin. Ew bi xwe reben e û di ser halan de, em hîn bêtir barê wî giran dikin. Dilovaniya Xwedê bê sinor e. Ne dût e ku dawîya dawî Xwedê wî têxe bin rehma xwe.

Li gora ku rexnegir dinivîsin; Pûşkîn gelekî ji bersîva wî mero-vê Yezîdî razî bû. Pûşkîn bi xwe li hember vê bersîvê nêrîna xwe wiha dinivîsîne: "Vê bersîvdanê ez gelekî rehet kirim. Ez gelekî kêf xweş bûm, ku ew ne kolê şeytan in. Herçî gunehkariya wan derbarê dinê wan de, ne pîr giran e..."

□

# Kê destana "Donê Bêpêjn" nivîsiye?

## Bavê Nazê

Piştî ku Mixayîl Şoloxov, sala 1965'an li ser romana xwe ya destane, xelata Nobel wergirt, li welatên Rojava propagandek mezin û fireh çêbû ku roman ne nivîsa Şoloxov e.

Payîza sala 1977'an li Parisê lêkolînek di vî warî de belav bû ku Soljenitsen pêşgotinek jê re nivîsandibû. Xwediyê nivîsê di bin tîpa "D" pirtûka xwe belav kiribû. Wî tê de nivîsibû ku "Dona Bêpêjn" ne ya M. Soloxov e, lê ew ya nivîskarê Rûs Apiyador Krukov e.

Dibe ji ber vî yekê, pisporê literatûra Rûsî Gayrîr Hêtso grûbek ji Swêdî û Norweciyên di sala 1975'an de damezirand. Wê grûb biryar stend ku berhemên A. Krukov û M. Soloxov bidin ber hev û bi alikariya "kompîtorê" bi deh hezaran gotinên ji 14 berhemên Krukov hemberî bêjeyên hemû nivîsên Şoloxov bikin. Li gora dirêjbûna gotin û hevokan û rengê bikaranîna gotinan û hîmê tekstên herdu nivîskarên, belû bû ku pîvanên "kompîtorê" da xwiyakirin ku destana "Dona Bêpêjn" ji nivîsa Soloxov e.

Gelo çima ev babîsok li xwediyê romana bi nav û deng rabû? Berî her tiştî ev berhema ji sosyalîzmê ya yekem bû ku xelata Nobelê stendibû. Ji ber vî yekê bi mebestên idiyalî navê "dizîyê" bi pey Şoloxov xistin.

Gelo çî argument di destên wan de hebûn? Yek ji wan temenê Şoloxov bû. Wan digotin ku îmkana xortekî 20 salî tuneye ku romaneke wiha binivîse.

Weke nas e, Şoloxov di sala 1905'an de ji dayika xwe bûbû û di sala 1925'an de dest bi cildê yekem ê romana xwe kiribû. Di sala 1928'an de pirtûka pêşî ji çar pirtûkên destanê belav bû.

Argumenta duyem di destên di-minê Soloxov de, ew bû ku nivîskar piştî "Donê Bêpêjn" û heya mirina xwe berhemek din, bi sewiyek weha bilind ne nivîsand.

Em pê dizanin ku "kompîtor" ji benda nivîskarê mezin Şoloxov derket, lê ku lêkolînek wiha li ser pirtûkên hin nivîskarên Kurd çê bibe, gelo ewê hevalbendên kê derkevin?

□

## Fîşa abonetiya Armançê

- Salek
- Şeş Meh

### Abonetiya salekê

Li Skandinavya	120 Skr
Li Ewropa	50 DM
Li derveyî Ewropa	35 \$

Tarîx: .....

Nav û paşnav: .....

Navnîşan: .....

Welat: .....

Postgiro: 50 37 99-9 Sweden

Heqê abonetiya xwe li ser postgiroya jorê bişnin. Fotokopiya kvîtoya heqê abonetiye û fîşa jorin dagirin li ser adresa jêrin ji me re bişnin.

Adres: P. Box 6004, 172 06 Sundbyberg/Sweden

## ne karê aqila ye lê rast e

### Amadekar: Hesên Mizgîn

□Li Japonyayê niha kursiyên tuwale-tê yên bi data (kompîtor) çêdikin. Ku mirov li ser van kursiyên rudinê germ dibin û piştî ku mirov rabû kaxiza li ser kursiyê bi awakî otomatîk tê guhertin. Hîn ji van kursiyên pîrr luks in; termometroyên wan, aletên pîvana tansiyonê û tahlîlkirina mîzê ji di wan de hene.

□Di sala 1980'yî de li Swêdê 20.000 otomobil hatin dizîn. Ev hejmar di sala 1989'an de bû 46.000. Li gor lêkolîna ku şirketên sigortayê çêkirine kesên ku di qezayan de dimrin piraniya wan ji otomobilên hatine dizîn in.

□Li Swêdê di sedsala 15'an de cezayên pîrr giran didan kesên diz. Ji bo diziyên mezin cezayê dardekirin bû. Lê ji diziyên piçûk re cezayên wek guhjêkirin an jî şiv lêxistin dihat dayîn.

□Di sedsala 16'an de li Brîtanya Mezin çêrkirin(sihêfkirinê) qedexe kirin. Dema ku dadgehê îspat dikir ku yekî çêr kirine kesê sêdard cerek din çêr bîkîra dikete hefsê.

□Çarê Rûsya di sala 1634'an de ji ordiya xwe re cixare kişandinê qedexe kir. Ji ber ku agirê zerarên mezin dida ordiya wî agirê kişandinê bû. Ew kesê ku bi dizî cixare bikişanda û bihata dîtîna pozê wî dihat jêkirin.

□Perça zêr a herî mezin li Awustralyayê hatiye dîtîna. Giraniya vê perça zêr 214,3 kg bû û jê 85 kg zêrê paqij derketibû.

□Li gor lêkolînen ku hatine kirin di ava deryayên dinê de 10.000 milyon zêr heye. Li belê destxistina zêrên di ava deryayê de pîrr dijwar e. Ji tonêk ava bi xwê 10 mîlîgram zêr derdikeve. Ji bo ku mirov giramek zêr bi dest bixe divê 100 ton ava bi xwê ji sefêkên teybetî bête derbaskirin.

□Îro li bin ava deryayên dinê de nêzî 1milyon km kabloyên(têlên) telgrafê hene. kabloya telgrafa ya yekemîn di sala 1866'an de di navbera Amerika û Ewropayê de hat kişandin.

## Weşanên Nuh

### İKİ DÜNYA SAVAŞI ARASINDA IRAK'TA KÜRT SORUNU

(Li Iraqê di navberaher du şerên cihanê de pîrsa Kurdî)

Ev pirtûk wek wê ji navê wê jî bê fêmkirin, lêkolînek li ser Kurdistanê Iraqê ye. Nivîskar, li ser Kurdistanê Iraqê ye. Nivîskar, li ser dema di navbera şerê cihanê yê Yekem û Duyem de disekine. Orjînal pirtûkê bi Rûsî ye. J. Silav wê wergerandîye zimanê Tirkî.

Prof. Dr. Şakîrê Xido Kurdek ji Ermenîstana Sovyetê ye. Ew di sala 1930'yî de ji dayik bûye. Piştî gelek xebatên heja nuha di Akademiya Zanistî ya Ermenîstanê de li Enstutîya Rojhilat serokatiya beşê Kurdî dike.

Pirtûk 90 rûpel e û ji aliyê Weşanxana Jîna Nû ve di Çileyê Paşîn a 1990'î de hatiye çapkirin. Navnîşana xwestinê ev e: Jîna Nû Förlaget, Box 240 12, 750 24 Uppsala/Sweden

### ÇIYAYÊ AGIRÎ

Ev pirtûk wergera çiroka Yaşar Kemal a bi navê "Ağrı Dağı Efsanesi" ye. Şerefnaz ev eser wergerandîye Kurdî (Kurmançî), Weşanxana Çanda Kurdî jî îsal çap kiriye. Pirtûk wek orjînalê xwe ya Tirkî bi wêneyên Abîdîn Dîno hatiye xemilandin. Wek tê zanîn nivîskarê pirtûkê Kurd e û her wisa hedîse jî li Kurdîstanê derbas dibe. Pirtûk 128 rûpel e.

Adresa xwestinê: Weşanxana Çanda Kurdî, Box 161 39, 103 23 Stockholm / Sweden

### ORDIYA MÊŞÊN HUNGU

Ev pirtûk wergera çirokek zarokan a Bekîr Yildiz e. Navê pirtûkê yê orjînal ev e: "Arılar Ordusu". Ev çirok li Nemrûd derbas dibe. Şerefnaz bi Kurdîya xwe ya zelal ji Tirkî wergerandîye. Pirtûk bi rismên İsmail Gulgeç hatine xemilandin. Pirtûk 46 rûpel e û ji aliyê Çapxana Çanda Kurdî hatiye çapkirin.

Adresa xwestinê: Weşanxana Çanda Kurdî, Box 161 39, 103 23 Stockholm / Sweden

### GAZIYEK JI CERGÊ ASYA

Bi vî navî Xelîl Dihokî pirtûkek helbesta derxist. Di vî pirtûkê de 19 helbest hene. Xelîl Di-

hokî di sala 1951'an de li bajarê Dihokê ji dayik bûye. Dihokî di destpêka 1970'î dest bi nivîsandina helbestan dîke û helbestên xwe di kovara HEVKARÎ de wedîşîne. Helbestvan Dihokî di sala 1982'an de diwanek helbesta û di sala 1983'an de jî pirtûkek lêkolîne li ser kurteçîroka Kurdî weşandiye. Helbestvan ji sala 1987'an vir ve li Swêdê dijî. Pirtûk Kurdî ye û bi tîpên Latîni ye û 55 rûpel e.

Navnîşana xwestinê ev e: Xelîl Dihokî, Box 100 14, 630 10 Eskilstuna/Sweden.

### DEVLETLERARASI SÖMÜRGE KÜRDİSTAN (KURDISTAN; KOLONIYA NAVA DEWLETAN)

İsmail Beşikçi piştî mudeteke dirêj kitêbek bi navê "Kurdistan; koloniya nava dewletan" weşand. D qismê yekê yê pirtûkê de Beşikçi fikrên xwe yê li ser huviyeta Kurd û huviyeta Kurdistanî nivîsandîye, di qismê duduyan de fikrên xwe yê li ser çinên serdest ê Kurdî diyar dike. İsmail Beşikçi dema pirtûka xwe hazir kiriye li gor qanûnên Tirkîyê xwe sansur nekiriye. Di mesela Kurd û Kurdistanê de fikrên xwe bi zimanekî fêsih, basît û bi mîsalên vekirî nivîsandîye. Ji ber vî yekê pirtûk ji alî ilmî bêtir bi vî xusûsiyeta xwe balê dikşîne. Ger mirov bi hawakî din bibêje, pirtûk ne ji bo sed an du sed hezaran, ji bo 50 milyonî nivîsandîye. Ev pirtûka İsmail Beşikçi wek pirtûkên wî yê din hat topkirin û ew jî hat hepskirin.

Pirtûk bi Tirkî ye, bi ebata A4,180 rûpel e û ji aliyê "Alan Yayıncılık" hatiye çap kirin. Navnîşana xwestinê ev e: Alan Yayıncılık, Bağmuhasip sok. Talas Han, Kat 4, Cağaloğlu-İstanbul/Türkiye

### İTTİHAT-TERAKKİ VE KÜRTLER

(ttihat-Terakkî û Kurd)

Ev lêkolîna ji aliyê Dr. Naçî Kutlay ve hatiye nivîsandin. Kutlay di vî lêkolîna xwe de demên dawî yê İmparatoriya Osmanî û di destpêka avêtîna hîmên Cumhuriyeta Tirkîyê de rol û karektera İttihad-Terakkî û tîkiliyên wê yê bi Kurdan re û awirên wê yê çareserkirina mesela Kurd digre dest. Pirtûk bi Tirkî ye, 150 rûpel e û ji aliyê Weşanxana Vejin ve hatiye çapkirin.

Navnîşana xwestinê ev e: Weşanxana Vejin, Box 39122, 100 54 Stockholm/Sweden.

□